



Navê Orijînal / Orijinal Adı:

HASTALAR RİSALESİ

(Kürtçe Tercümesi)



Kurdiya wê / Tercüme: Ayhan Yıldız

Teshîh: Ramazan Çetin



Weşanxane / Neşreden:

Hizmet Vakfı Yayınları

Piyerloti Caddesi Dostlukyurdu Sokak No:10/2

34192 Çemberlitaş / İstanbul / Türkiye

tel: +90 212 516 20 49 fax: +90 212 517 77 58

e-mail: info@hizmetvakfi.org

www.hizmetvakfi.org

Sertifika No: 1206-34-003292



Çapxane / Baskı:

İmak Ofset Basım ve Yayın Tic. ve San. Ltd. Şti.

Merkez Mahallesi Göl Sokak No : 1 Yenibosna / İstanbul

İSTANBUL - HAZİRAN 2012

Çapa Yekemîn / Birinci Baskı



ISBN: 978-975-6321-76-8



© Copyright

Hemû mafên çapê yê û berhemê yê Hizmet Vakfı Yayınlarıyê ne.

Bu eserin, tamamen veya kısmen tüm telif hakları "Hizmet Vakfı Yayınları"na aittir.

Ji Kulliyata Rîsaleyên Nûr

Rîsaleya Nexweşan

Muellif:

**Bedîuzzeman
Seîdê Nûrsî**

Nîşe:

*Meal û ravekirinên ayet û hedîsan û
îbareyên bi Erebî
û bêjeyên di kevaneka çarçik [] de ne
di eslê metnê de nîn in, ji aliyê wergêr
ve lê hatî zêde kirin.*

Lem'eya Bîst û Pêncan

(Bîst û Pênc Derman in)

*Ji bo ku ji nexweşan re weke melhemekê,
teselliyekê û weke reçeteyeke manewî û
weke ku di meqamê çûna hafa nexweşekî
de be û ji nexweşan re bibêje “kefaretê
gunehan be”, hatiye nivîsandin.*

Hişyarî û Beyana Lêborînê

Ev reçeteya manewî, bi lezûbeziyeke (Haşîye) wisan hat nivîsandin ku heta niha me tu carî wisan zû nenivîsandiye. Bi ser de jî, hem qet ji me re zeman nema ku em mîna nivîsên berê, zeman bidin teshîh û diq-qetkirinê, hem jî, mîna wê zûnivîsandina wê, wisan gelek bi lez û bez, ancax yek carekê tenê di ber çavan de hat derbaskirin. Lewre weke musweddeyê pêşî de, bê pergala maye. Ji bo wan xatireyên ku bi awayekî fitrî hatine dilî, em bi huner û diqqetê, xera nekin, me hewce nedît ku ji nû ve hûr û kûr lê binihêrin. Zatên ku dixwînin, xusûsî jî, ew kesên nexweş, ji hin îbareyên nexweşîk an jî, ji wan kelîme û îfadeyên giran, bila netengijîn û bila li zora wan neçe; bila ji min re jî dua bikin.

Haşîye: Ev rîsale, di nav çar saet û nîvan de hatiye nivîsîn.

Belê	Belê	Belê	Belê
Ruşdî	Refet	Xusrew	Seîd

بِسْمِ اللَّهِ الرَّحْمَنِ الرَّحِيمِ¹

الَّذِينَ إِذَا أَصَابَتْهُمْ مُصِيبَةٌ قَالُوا إِنَّا لِلَّهِ وَإِنَّا إِلَيْهِ
رَاجِعُونَ * وَالَّذِي هُوَ يُطْعِمُنِي وَيَسْقِينِ *
وَإِذَا مَرِضْتُ فَهُوَ يَشْفِينِ²

Di vê Lem‘eyê de, em “Bîst û Pênc Derman”an bi kurtî beyan dikin ku ji bo wan mûsîbetzede û nexweşên ku yekê ji dehan ê qismê merivan in bibe teselliyeke heqîqî û melhemeke bişîfa.

1 Bi navê Xwedayê Rehman û Rehîm

2 Gava mûsîbetek tê serê wan, dibêjin: “Em ji bo Xwedê ne û em dê, ber bi Wî ve vegerin. (Sûreyê Beqere: 156) * Ew e yê ku bi min dide xwarin û vexwarin. Û gava ez nexweş dikevim, ê ku şîfa dide, Ew e. (Sûreyê Şûara: 79-80)

DERMANÊ YEKÊ

Ey nexweşê bêçare!

Mereq meke, sebîr bike. Nexweşîna te ji bo te ne derd e; belkî bi awayekî ji awayan derman e. Çimkî **‘imir, sermayeyek e, diçe. Ku meyweya wê tune be, weke belahêq diçe.** Hem gava ‘imir bi rehetî û xefletê be, gelek zû diçe. Îca nexweşîn, wê sermayeya te, bi kar û qezencên mezin meywedardike. Hem nahêle ku ‘imir zû derbas bibe, bi ‘imrê te digre, dirêj dike; heta ku meyweyên xwe bide, peyre wan bihêle û biçê. Ha, ev gotina pêşîyan ku li ser zar û zimanan bûye destan, îşaret dike ku **‘imir, bi nexweşîna dirêj dibe: “Dema mûsîbetê gelek dirêj e, dema xweşiyê/sefayê zaf kurt dibe.”**

DERMANÊ DUDUYAN

Ey nexweşê bêsebir!

Sebîr bike, belkî şukur bike. Ev nexweşîna te, dikare her yek deqîqeyeke ‘imrê te, bixe hukmê saetêke îbadetê. Lewre **îbadet du beş e:**

Yek jê, îbadetê musbet e ku ev jî, îbadetên malûm ên mîna nimêj û niyazê ne.

Ê din, îbadetên menfî ne ku mûsîbetzede bi wesîteya nexweşîn û mûsîbetan, bi ‘ecza/neçariya

xwe dihesê û xwe dipenêhe û dispêre Xaliqê xwe yê Rehîm û pê re zarebar dike. Bi vî awayî dibe mezherê îbadetekî xalis û manewî yê bê-riya. Belê, rîwayetên sehîh hene ku tê gotin, **‘imrekî ku bi nexweşînê derbas dibe, bi şertê ku gilî û gazin ji Xwedê neyin kirin, ji bo mumînan, îbadet tê hesibandin.** Hetta bi rîwayeta sehîh û bi keşfên sadiq sabit e ku yek deqîqeyeke nexweşîna hinek nexweşên ku sebir dikin û şakir in, ketiye hukmê saetêke îbadetê û yek deqîqeyeke hinek ji merivên kamil, ketiye hukmê rojêke îbadetê. Ji nexweşîna ku yek deqîqeyeke ‘imrê te, tîne dixê hukmê hezar deqîqeyî û ‘imrekî dirêj ji te re dide qezenckirin, gilî û gazin meke; ji nexweşînê re bibêje Xwedê ji te razî be.

DERMANÊ SISÊYAN

Hey nexweşê bêtehemmul!

Misêwa çuyîna van ên ku tên.. û pîrûkalbûna ciwanan.. û misêwa gêndirbûna wan a di fîraq û zewalê de şahid e ku meriv, ne ji bo ku xwe bide kêf û lezzetê hatiye dunyayê. Hem digel ku meriv, di nav xwedîjiyanan de, yê herî mukemmel û bilind e û ji aliyê cîhaz û uzwên xwe ve, yê herî zengîn e û hetta sultanê xwedîjiyanan e jî, ji ber wesîteya li ser

wan lezzetên derbasbûyî û li ser wan belayên ku dê bîn, diponije, li hember heywanan, di dereceyeke herî edna de, ancax jiyaneye bikeder û bi zehmetî derbas dike. Nexwe meriv, tenê ji bo ku xweş bijî û ‘imrê xwe bi rehetî, kêf û şahî derbas bike nehatiye vê dunyayê. Belkî, ev merivê ku sermayeyeke mezin di destê wî/wê de heye, li vê derê, tevî tîcaretê/bazirganiyê, ji bo ku li ser seadeta jiyaneye ebedî, daîmî bixebite hatiye. Sermayeya ku dane destê wî/wê jî, ‘imr e. Heke nexweşîn tune be, sihhet û afiyet, xefletê dide merivan... Jê re dunyayê xweş nîşan dide, axretê dide jîbîrakirin. Ew, naxwaze ku qebr/gor û mirinê bîne bîra xwe. Sermayeya imrê wî beredayî, li haşê dide serfkirin. Îca nexweşîn, tavilê çavê wî dide vekirin. Ji wucûd û cesedê wî re dibêje ku: **“Tu ne layemût/nemir î, ne serberdayî yî, wezîfeyeke te heye. Dest ji quretiyê berde, li Yê ku te xuluqandiye bifikire, bizane ku tu dê bikevî gorê, wisan xwe amade bike.”**

Ha nexweşîn, ji vê hêlê ve, nesîhetkarekî wisan e ku qet naxapîne û murşîdekî wisan e ku hişyarkir e. Ji wê, gîlî û şekwa na; belkî ji vî aliyî ve divê tu jê re spas bikî; gava ku zêde giran bê, divê sebir bê xwestin.

DERMANÊ ÇARAN

Lo hey nexweşê ku gilî û gazin dike!

Heqê te ne gilî û şekwa ye; şukur e, sebir e. Lewre, wucûda te, aza û cîhazên te, ne mulkê te ne. Te, ew çê nekirine. Te ew ji destgehên din jî nekirîne. Nexwe ew, mulkên yekî din in. Xwediyê wan, di mulkê xwe de, çawan bixwaze, wisan teserruf dike. Çawan ku di Kelîmeya/Peyva Bîst û Şêşan de hatiye gotin, mesela: Hunerwerekî gelek dewlemend, gelek mahîr û şareza, ji bo ku hunera xwe ya xweşik, serweta xwe ya biqîmet nîşan bide, merivêkî miskîn, bi modeliyê dide wezîfedarkirin. Bi vê amancê, di bergîdana ucretekê de, di demeke yeksaetî de, îşlikekî ku bi awayekî xemilandî û gelek bi hunerî -hulleyekî- dirûtiye, li wî feqîrî dike. Li ser wî feqîrî, wî îşlikî dihûne û wezîyetan dide wî. Ji bo ku cûreyên hunera xwe nîşan bide, wî kincî dibire, diguhêre, dirêj dike, kurt dike. Gelo ev merivê miskîn ê biucret, ji wî zatî re bibêje: “Tu zehmetê didî min, bi vê wezîyeta xwarkirin û rakirinê, tu min aciz dikî. Ji ber ku tu vî îşlikê ku min xweşik dike, dibirî û kurt dikî, tu xweşikiya min xera dikî.” Ka heqê wî heye? Ka gelo dikare bibeje ku: “Te bêmerhemetî kir, bêînsafî kir.”

Ha eynî mîna vê mîsalê, Sani'ê Zulcelal, ji te re hey nexweşo/ê! Ev îşlikê cism li te kiriye, ku bi hestên nûranî yên mîna çav, guh, aqil û dil muresse/xemilandî ye, ji bo ku neqîşên Esmayên xwe yên Husna nîşan bide, te dixê gelek rewşan û te dizivirîne û te dixê gelek wezîyetên cihê cihê. Çawan ku tu, bi birçîtiyê, navê wî yê **Rezraq** nas dikî, navê wî yê **Şafî** jî, bi nexweşîna xwe bizane. **Ji ber ku elem, musîbet, hin hukmên esmayên wî nîşan didin, di wan de, ji hîkmetê, hin lem'e hene û ji rehmetê jî, şu'a hene û di nav wan şu'ayan de, gelek xweşîkî hene.** Heke perde vebe, di pişt perdeya wê nexweşîna ku tu jê dikeví dehşetê û jê nefret dikî, tu dê wateyên şîrîn û xweşîk bibînî.

DERMANÊ PÊNCAN

Hey nexweşê ku mubtelayê merezê ye!

Vê dewrê, bi tecrubeya min, qenaet ji min re çê bûye ku nexweşîna di vî zemanî de, ji hinekan re îhsaneke Îlahî ye, xelateke Rehmanî ye. Ev heşt neh sal e, digel ku ne layîq im jî, hinek zatên ciwan, ji ber nexweşînê, ji bo duayê hatin cem min. Me hev dît û min bal û dêhna xwe da wan, kîjan ciwanê ku

min dît ku ew nexweş e, li gor ciwanên dî, bêhtir li ser axreta xwe difikire. Pê re serxweşiya ciwantiyê tune ye. Ji hewesên heywanî yên nava xefletê, wî, xwe hinekî xelas kiriye. Min jî dinihêrt, min dianî bîra wan, ev nexweşînên ku meriv dikare xwe li ber wan ragire, ji wan re îhsaneke Îlahî ne. Min digot: “Birayê min, ez ne li ‘eleyhê/dijî vê nexweşîna te me. Ji ber vê nexweşînê, ka şefqetek di dilê min de peyda nabe û dilê min bi te naêşe ku ji te re dua bikim. Heta zemanê ku nexweşîn, te tam û baş hişyar bike, zorê bide sebrê, sebir bike. Nexweşîn, piştî ku wezîfeya xwe qedand, Xaliqê Rehîm, înzellâh dê şîfa bide te.” Hem min digot: “Hinek ji kesên mîna te, ji ber belaya sihhetê dikevin xefletê, nimêjê terk dikin, qebrê naynin bîra xwe, Xwedê jibîra dikin, ji ber kêfa zahirî ya yek saetêke jiyana dunyayê, wê heyata ebedî ya bêhed dihejîne, zarar û zede didê, heta belkî jî xera dike. Bi çavê vê nexweşînê, li wê qebra xwe ya ku menzîleke te ye û bê guman tu dê biçî wê derê û wan menzîlên axretî ku li pişt wê qebrê ne, tu dê bibînî û tu li wê goriyê tevbigeri. **Nexwe ji bo te nexweşîn, sihhetek e. Îca ew sihheta ku bi hinek hevalên te re heye, nexweşînek bi xwe ye.**

DERMANÊ ŞEŞAN

Hey nexweşê ku ji elemê digazine!

Ji te dipirsim: Li ‘imrê xwe yê bihurî bifikire û wan rojên ku di ‘imrê te de bi kêf û lezzet bûn û wan weqtên ku bi bela û bi elem bûn, bîne bîra xwe. Helbet an tu dê bibêjî “Ox! an jî bibêjî “Ax!” Yanî, dilê te yan zimanê te, yan dê bibêje “Elhemdulîllah şukur” an jî dê bibêje “Wa hesreta! Wa esefa!” Bal û dêhna xwe bidê, tiştê ku **“Ox, elhemdulîllah, şukur”** bi te dide gotin, ew elemên ku hatibûn serê te û çûne û gava tu li wan musîbetan difikirî, ji te re lezzetêke manewî der dike; loma dilê te şukur dike. Çimkî zewala elemê, lezzet e. Wê elem û wê mûsîbetê, bi zewalbûna xwe, di wî rûhî de lezzetek, irsiyet hiştiye ku gava lê bê fikirîn, der dibe û ji rûhî, lezzet diherike, şukur, diniqutin. Îca tiştê ku “Wa esefa! Wa hesreta!” bi te dide gotin, ew halên bilezzet û bikêf in ku di zemanê bihûrî de hatibûn serê te; îca wan jî, bi zewalbûna xwe di rûhê te de elemeke daimî irsiyet hiştiye û kengê gava tu wan bînî bîra xwe, ew elem dîsa der dibe, esef û hesretê diherikîne. Madem lezzetêke nemeşrû ya yek rojekê, carinan elemeke manewî ya bi qasî salekê, [bi merivan] dide kişandin. Û elema demborî ku

ji nexweşîneke bi qasî rojekê tê, lezzetên manewî yên bi qasî gelek rojan bi xwe re tîne û gava ew nexweşîn diqede û meriv jê xelas dibe, tevî xêrê, lezeteke manewî heye. Îca tu jî, ha li encam/aqûbet û xêra wê ya hundir a vê nexweşîna xwe serpeyî/ muweqqet a niha ku li ser te ye, bifikire. Bibêje “**Ev jî dê derbas bibe, ya Hû**” û di ciyê gilî û gazinan de şukur bike.

DERMANÊ ŞEŞAN (Haşiye)

Hey birayê min ê ku zewqa dunyayê tîne bîra xwe loma ji her nexweşînê di nav izdirabê de dinale!

Heger ev dunya ebedî bûya û li ser rêya me, mirin tunebûya û bayên fîraq û zewalê nehatina û di ayendeya bimûsîbet û bifirtûne de, demsalên manewî yên zivistanê tune bûna, ez jî bi te re, dê bi halê te biêşiyama. Îca madem dunya, rojekê dê ji me re bibêje “Haydê, derve!” Û ji feryada me, dê guhê xwe bigre. Hîna berî ku wê em bereder nekirine,

Haşiye: Ji ber ku ev Lem'e bi awayekî fitrî hat bîrê, di Mertebeya Şeşan de, du derman hatine nivîsandin. Ji bo xatirê ku em têkilî fitrîtiya wê nebin, me wisan hişt; me got dibe ku sirrek/razek tê de hebe, me neguherand.

em bi hişyarkirina van nexweşînan, ji niha ve divê em dev ji eşqa wê berdin. Berî ku ew me terk bike, divê em hewl bidin ku bi dilê xwe, wê terk bikin. Belê nexweşîn, vê wateyê/manayê dixe bîra me û ji guhê dil re bi nepenî/veşarî îxtar dike û dibêje ku: **“Wucûda te, ne ji kevir e, ne ji hesin e. Belkî ji wan maddeyên muxtelîf ku tim û daîm musaîd in ku ji hev biqetin, hatiye terkîbkirin û çêkirin. Dev ji xurûrê berde, ji neçariya xwe fêr bike. Xwediyê xwe nas bike, bi wezîfeya xwe bizane, hîn bibe ka tu ji bo çi hatiyî dunyayê.”**

Hem madem zewq û lezzeta dunyayê, dewam nake. Nemaze gava ne meşrû be, hem ne berdewam e, hem bi elem e hem jî dibe bi guneh. Îca ji ber ku te ew zewq wînda kiriye, bi hinceta nexweşîne megirî; berevajiyê wê, li aliyê nexweşîne ku îbadetê manewî û xêra axretî tê de hene bifikire, hewl bide ku tu jê zewq bistîni.

DERMANÊ HEFTAN

Hey nexweşê ku lezzeta sihheta xwe wînda kiriye!

Nexweşîna te, wê lezzeta nîmetê Îlahî ku di sihhetê de heye, nade revandin; berevajiyê wê, bi

tehm dike û lezzeta wê zêde dike. Çimkî, gava ku tiştêk dewam bike tesîra xwe winda dike. Hetta ehlê heqîqetê, bi yekdevkî dibêjin ku:

إِنَّمَا الْأَشْيَاءُ تُعْرَفُ بِأَضْدَادِهَا

Ango: “Her tişt bi ziddê/dijberê xwe tê zanîn.”

Mesela, heke tarîfî tune be, ronî naye zanîn, bê lezzet dimîne.

Heke serma û seqem tune be, meriv ji germê fêr nake, bê zewq dimîne.

Heke birçîfî tune be, xwarin tehmê nade.

Gava ku heraret û kelewaca mîde tune be, vexwarina avê, zewqê nade.

Ku illet û nexweşî tune be, afiyet bê zewq e.

Ne ji merezê be, sihhet bê lezzet e.

Madem Fatirê Hekîm, dixwaze ku her cûre îhsanên xwe bi merivan bide îhsaskirin û her tur/cûre nîmetê xwe bide tehmkirin û dixwaze ku merivan her daîm sewqî şukrê bike û ji bo vê yekê jî, di vê kaînatê de, însan wisan bi gelek cîhazên zêde daye techîzkirin ku karibe her cûre nîmetî tehm bike, nas bike. Îca ev bi xwe jî nîşan dide ku Wî çawan sihhet û afiyet daye, wisan jî, helbet Ew dê nexweşî, illet û derdan jî bide. Ez ji te dipirsim:

“Heke ev nexweşîn, di serê te de yan jî di destê te de yan jî di mîdeyê/madeyê te de tune bûya, ka tu dê bi wî nîmetê Îlahî yê ku bi lezzet û bi zewq e û di serî û dest û mîdeyê te de ye, bihisîyay û te dê bi qîmeta wan bizanibûya û şukur bikira gelo? Helbet ne şukur, belkî tu dê li ser wan nefikiriya jî. Te dê ew sihhet, bi awayekî bêşuûrî, li ser xefletê, belkî li ser sefahetê/sefîhiyê serf bikira.

DERMANÊ HEŞTAN

Hey nexweşê ku li ser axreta xwe difikire!

Nexweşîn, mîna sabûnê, qîlçîya gunchan dişû, paqij dike. Bi hedîsa sehîh sabit e ku nexweşîn, kefarete gunehan e. Hem di hedîsê de heye ku: **“Meriv, gava dara gihaştî û pirxulî dihejîne, ew fêkîyên/meyweyên wê çawan dikevin, ew nexweşê/nexweşa biîman jî, gava ku (bi tayê dikeve û) direhile, nexweşîn, gunehên wê/wî, eynî wisan diweşîne.”**

Guneh, nexweşînên daîmî yên di heyata ebedî de; heta li vê jiyana dunyayê jî, ji bo dîl, wicdan û rûh, ew bi xwe, nexweşînên manewî ne. Heke tu sebir bikî, gilî û gazinan nekî, tu bi vê yek nexweşîneke muweqqet/demborî, ji gelek nexweşînên daîmî xelas

dibî. Heke tu, ji guhenên nepenî nekevî fikaran yan jî heke tu, bi axretê nizanibî yan jî Xwedê nas nekî, bi te re nexweşîneke wisan bidehşet heye ku bi milyonan carî, ji vê nexweşîna biçûk a ku bi te re heye mezintir e. Ha, ji wê, feryad û fîzar bike. Çimkî dilê te, rûhê te û nefsa te, bi temamê wan mewcûdên dunyayê re eleqedar e. Misêwa, bi fîraqê/veqetînê û bi zewalê, ew eleqe û têkilî diqetin, tên birîn û di (dilê) te de birînên bêhed tên vekirin. Baxusûs, ji ber ku tu bi axretê nizanî û ji ber ku tu bi çavê îdama ebedî li mirinê dinihêrî û texeyyul dikî, wisan li te dibe, mîna ku wucûdeke te ya nexweş a ku bi qasî dunyayê hebe û di nav kul û birînan de be. Ha serê ewil, ji bo vê wucûda xwe ya mezin a manewî ku tê de bêhed birîn hene û nexweş e, divê tu li dermanan bigerî. Îca ji van nexweşînan bêhed ên wucûda te ya manewî re, melhema îmanê ku qet'î derman û qet'î şîfadar e, ew e ku tu lê bigerî û îtîqada xwe sererast bikî. Divê tu li wê tilyakê bigerî. Îca rêya herî kurtebir, ew e ku bi xêra vê nexweşîna maddî ku ew perdeya xefletê hatiye qelaştin, tu di paceya kêmqewetî û zeîfiya xwe de, qudret û rehmeta Qadirekî Zulcelal nas bikî.

Belê, bi qasî tijehiya dunyayê, bela li ser serê wan ên ku Xwedê nas nakin hene. Îca dunyaya

wan [kes]ên ku Xwedê nas dîkin, bi nûr û surûra/kêfa manewî tije ye. Li gor dereceya xwe, bi qeweta îmanê, [meriv] pê dihesê. Di bin vê surûr, şîfa û lezzeta manewî ku ji îmanê tê de, elema wan nexweşînên cuz-î yên maddî, dihele û diperçiqe/ dipelixe.

DERMANÊ NEHAN

Hey nexweşê ku Xaliqê xwe nas dike!

Îca ew elem, tewehuş û tîrsa ku di nexweşînan de heye, ji ber wê yekê ye ku yekcaran/carinan nexweşîn, dibe sedema mirinê. Mirin, bi çavê xefletê û ji aliyê xwe yê zahirî ve, ji ber ku bi dehşet e, ew nexweşînên ku ji mirinê re dibin navgîn û wesîle jî, merivan ditirsînin û dixin nava metirsî û gumanan.

Serê pêşî, bizane û qet'î îman bîne ku: **“Ecel, muqedder e û tayînkirî ye; naguhêre.”** Gelek kesên ku li ser wan nexweşên ku êşa wan giran bûye giriyane û sihheta wan baş bûye hebûne, ew mirine; lê belê ew nexweşên êşgiran, baş bûne û jiyane.

Ê duduyan: Mirin, bi awayê xwe yê sûretî ku dixuye, wisan ne bi dehşet e. Di gelek rîsaleyan de, bi awayekî gelek qet'î, bê şik û bê guman, bi wê

nûra ku Qurana Hekîm daye, me îsbat kiriye ku: Mirin, ji bo ehlê îmanê, ji kulfet û zehmetiya vê wezîfeya heyatê, terxîsek e.

Hem mirin, di îmtîhana vê meydana dunyayê de, ji wê ubûdiyeta ku talîm û talîmat e, paydosek e.

Hem wesîleyek e, ji bo ku meriv pê bigihîje wan dost, ehbab û merivên xwe ku ji sedî notê wan, koçî alema dî kiriye.

Hem wesîteyek e ku meriv pê biçê welatê xwe yê heqîqî û meqamê xwe yê seadeta ebedî.

Hem vexwendineke wisan e ku ew, merivan ji zîndana dunyayê vedixwîne bostana cennetê.

Hem mirin, nobet bi xwe ye ku meriv, li gor wê xizmeta ku kiriye, dê ji fezla Xaliqê xwe yê Rehîm ucureta xwe bigre.

Madem mahiyeta mirinê, ji hêla heqîqetê ve ev e, divê meriv ne bi çavê dehşetê lê binihêre; berevajiyê vê, divê meriv bi nezera/çavê ku ew, destpêkeke rehmet û seadetê ye binihêre. Hem qismek ji ehlullahî û dostên Xwedê ku ji mirinê tirsiyane, ne ji ber dehşeta mirinê ye. Belkî ji ber wê yekê ye ku wan, çav berdaye xêrê û çavê wan lê bûye ku di wezîfeya xwe ya jiyana vê derê de, hê jî,

xêr û xêratan bikin. Erê, mirin, ji bo ehlê îmanê deriyê rehmetê ye. Ji bo ehlê dalaletê, ew bîr e ku zulûmata ebedî û tarîtiyeke bêdawî ye.

DERMANÊ DEHAN

Hey nexweşê ku beredayî mereq dike!

Tu ji ber giraniya nexweşînê, mereq dikî. Ew mereqa te, dike ku nexweşîna te giran bibe. Heke tu bixwazî ku nexweşîn li te sivik bibe, hewl bide ku tu mereq nekî. Yanî feyde û xêra nexweşînê bine bîra xwe û bifikire ku ev nexweşîn, dê zû derbas bibe û mereqê ji ser xwe rake, bi vî awayî koka nexweşînê bibire. Erê, mereq, nexweşînê du qatî dike û di bin nexweşîna maddî de, bi rêya mereqê, nexweşîneke manewî li dilê te bar dike, êdî ew nexweşîna maddî, ber û palê xwe dide wê nexweşîna manewî û dewam dike. Heke bi teslîmiyet, bi razîbûn û bi hizr û fikra li ser hîkmetê nexweşînê tê kirin ew mereq rabe here, kokeke girîng a wê nexweşîna maddî tê birîn, ew êş sivik dibe, bi qismî diçe. Îca bi wehm û dilwasewasiyan, nexweşîneke maddî ya bi qasî dirhemekê, yekcaran, bi wesîteya mereqê, bi qasî deh dirheman mezin dibe. Gava mereq tê birrîn, ji dehan nehê wê nexweşînê diçe. Mereq, çawan ku

nexweşînê zêde dike, wisan jî, ji ber ku hîkmetê Îlahî îttîham dike û rehmeta Îlahî rexne dike û ji ber ku di hukmê wê yekê de ye ku gilî û gazine ji Xaliqê xwe yê Rehîm dike, bi ‘eksê meqseda xwe sîle/şîmaq dixwe, nexweşîna xwe zêde dike.

Belê, çawan ku şukur, nîmetê zêde dike, wisan gilî û gazine jî, nexweşîn û musîbetê zêdetir dike. Hem mereq bi xwe jî nexweşînek e. Dermanê wê ew e ku meriv bi hîkmetê wê nexweşînê bizan(ib) e. Madem tu bi hîkmetê wê, bi feydeya wê hesiyay û tu pê dizanî, îca wê melhemê li ser mereqê bixe, jê bifilite. Li şûna “Ax!” bibêje “Ox!”, di ciyê “Wa esefa!” de, bibêje

الْحَمْدُ لِلَّهِ عَلَى كُلِّ حَالٍ¹

DERMANÊ YANZDEHAN

Lo birayê nexweş ê bêsebir!

Digel ku nexweşîn, elemeke hazir dide te jî; ji ber ku tu ji wê nexweşîna xwe ya berê xelas bûy, heta îro, ji ber ku ew nexweşîna te ya berê qediyaye, lezzetê manewî dide te û ji ber xêra

1 Li ser her hal û rewşî, hemd ji Xwedê re be.

wê jî, lezzeteke rûhî bi destê te dikeve. Ji îro pê ve, hetta, ji vê saetê bi şûn de, êdî nexweşîn tune ye; helbet ji tunetiyê elem tune ye. Heke elem nebe, xemgînî jî nabe. Ji ber ku tu, bi awayekî xelet dikevî wehm û dilwasewasiyan, bêsebrî bi ser te de tê û tu nikarî sebir bikî. Lewre hemû maddîtiya wê dema nexweşîna berî îro, çûye û elema wê jî, pê re çûye. Tiştê ku jê maye, xêra wê ye û ew lezzeta ku ji ber xelasbûna wê hatiye heye. Divê ku kar, qezenc û kêfê bide te. Îca digel vî awayî jî heke tu li ser wan bîponijî û xwe bixî nava eleman û bêsebrîyê bikî, dîwanetî ye. Rojên dahatuyê, hîna nehatine. Heke meriv, ji niha ve li ser wan bîponije, di rojeke ku tune ye de, ji ber nexweşîneke ku tune ye, meriv rabe ji elemeke ku tune ye, tewehhum û fikaran bike û xwe bixe nava eleman û bêsebrî bike û bi vî awayî, sê mertebeyan/dereceyan rengê hebûnê bide tunetîya ku tune ye, îca ne dîwanetî be, ka çi ye?

Madem ew demên wan nexweşînên berî vê saetê, kêfê dide merivan. Û madem zemanê di pey vê saetê de hîna tune ye, nexweşîn jî, a niha tune ye, vê gavê elem jî tune ye. Tu jî, temamê wê qeweta sebrê ku Cenabê Heq daye te, bi vir de wê de ji hev belav meke; li hember elema vê saetê, qeweta wan bide hev; bibêje **“Ya Sebûr”** û li ber xwe bide.

DERMANÊ DUWAZDEHAN

Hey nexweşê ku ji ber nexweşînê, ji îbadet û wirdên xwe marûm dimîne û ji ber vê marûmîyetê jî, teessuf dike!

Bizanibe, bi hedîsê sabit e ku: “Mumînekî/e mutteqî, xêra wan wirdên xwe yên daîmî ku ji ber nexweşînê nikare bike, di dema nexweşînê de jî qezenc dike.” Nexweşekî/e ku heta jê tê, ferzan tîne cî, di dema wê nexweşîna giran de jî, bi şertê ku sebir û tewekkul bike û ferzên xwe bîne cî, gava nexweş dikeve, xêra wan sunnetên xwe yên ku di wextên berê de dikir, bi awayekî xalis, digre.

Hem nexweşîn, ‘ecz, neçarî û feqîriya merivan bi merivan dide hisandin. Bi lîsanê wê ‘eczê û bi zimanê wê kêmqewetiyê, bi awayekî halî û qalî duayekê dide kirin. Cenabê Heq, ‘eczeke/kêmqewetiyeke bêhed û zeîfiyeke bênîhayet daye merivan; da ku bi awayekî daîmî, xwe bipenêhe dergehê Îlahî û niyaz bike û dua bike.

قُلْ مَا يَعْْبُوْا بِكُمْ رَبِّيْ لَوْلَا دُعَاؤُكُمْ¹

1 Sûreyê Furqan: 72

Ango “**Heke ne ji duaya we be, ka çi girîngiya we heye?**” Bi sirrê/raza vê ayetê, hîkmetê xulqiyeta mirovan û sedemê qîmeta mirov, ew duaya samîmî bi xwe ye û sedemekî niyazê jî, ew nexweşîn bi xwe ne. Nexweşîn ku sebebekî duaya jidil û niyazê ku hîkmetê xulqiyet û sebebê qîmeta însên e, divê ku mirov, gilî û gazinan jê neke û bi ser de jî divê meriv ji Xwedê re şukur bike; îca wê musluxa duayê ku bi xêra nexweşînê vebûye, divê meriv, bi qezenckirina afiyetê, negre.

DERMANÊ SÊZDEHAN

Hey merivê bêçare yê ku ji nexweşînê gilî û gazinan dike!

Nexweşîn ji hinekan re defîneyeke girîng û xelateke Îlahî ya gelek hêja ye. Her nexweş, dikare ji wî aliyê ve li nexweşîna xwe binihêre û bifikire. Madem dema ecelê naye zanîn; lê belê Cenabê Heq, ji bo ku merivan ji bêhêviya mutleq û ji xefleta mutleq xelas bike û ji bo ku merivan di navbera xewf û recayê [tirs û hêvîdarî] de bigre û hem ji bo ku merivan di wî cîyê ku meriv hem hay ji dunyaya xwe hebe hem jî hay ji axreta xwe hebe de bigre, bi

hîkmetê xwe [Wî (c.c)] ecel veşartiye. **Madem her weqt dibe ku ecel bê.** Heke di xefletê de bi merivan bigre, dibe ku gelek zerrarên zêde bide heyata meriv a ebedî. Îca nexweşîn ku heye, xefletê ji hev belav dike û dike ku meriv li ser axretê bifikire û bi ser de jî, mirinê tîne bîra merivan û bi vî awayî dike ku meriv xwe amade bike. Carcaran meriv wisan kar û qezencan bi dest dixê, ciyê ku meriv bîst salî bixebite û bigihîje wê mertebeyê, meriv di bîst rojî de wê mertebeyê qezenc dike.

Mîna vê yekê, du ciwan ji hevalên me -Xwedê rehma xwe li wan bike- hebûn. Yek jê Îlamalî Sebrî, yê dî Îslamkoylu Wezîrzade Mustefa... Ev her du zat, di nav telebeyên min de, digel ku yên bêqelem bûn jî, min bala xwe dida wan û min bi awayekî hejmetkar û heyretkar didît ku di samîmîyetê de û di xîzmeta îmanê de, ew li sefên herî pêş bûn. Min nizanibû ka ev çî hîkmet e. Di pey wefata wan de min fam kir ku bi wan herduyan re jî, nexweşîneke girîng hebû. Bi îrşada wê nexweşînê, li hember wan ciwanên din ên xafil û wan kesên ku terka ferzan dikirin, ew ketin nav teqwayeke herî muhîm û xizmeteke herî biqîmet û weziyeteke ku ji axretê re bi feyde bûn. Înşallah, zehmetiya wan du salên nexweşînê,

bû medarê qezenckirina bi milyonan salên seadeta wê heyata ebedî. Ew duaya ku carcaran, min ji bo sihheta wan fikir, a niha ez fêr dikim... Nexwe di hêla dunyayê de bûye nîfir. Înşallah ew duaya min, ji bo sihheta wan a axretî hatiye qebûlkin.

Ha ev her du zat, bi îtîqad û baweriya min, bi qasî qezenceke ku meriv bi teqwayeke deh salan bixebite û peyre qezenc bike wan wisan qezenc kir. Heke ew her du ciwan, mîna hinek ciwanan, bi sihhet û ciwaniya xwe ewle bibûna û wan xwe biavêta nav xeflet û sefîhiyê û heke mirinê jî, çavdêriya wan bikira û [mewtê,] tam di nav pîsîtiyên gunehan de ew bigirtina, wan dê gora/qebra xwe, li şûna defîneya wan nûran, bikira hêlîna dûvpişk û maran.

Madem menfîetên wiha yê nexweşînan hene, meriv, ji wan gilî û gazineke; meriv divê bi tewekkul û sebrê, heta belkî bi şukrê, îtimadî rehmeta Îlahî bike.

DERMANÊ ÇARDEHAN

Hey nexweşê ku perde hatiye ser çavê wî!

Heke tu bizanibî ku di bin wê perdeya ku hatiye ser çavê ehlê îmanê de nûreke çawan û çavekî

çawan ê manewî heye, tu dê bibêjî, **“Sed hezar şukur ji Rebbê min ê Rehîm re be...”** Ji bo raveya vê melhemê, ez dê bûyerekê bibêjim:

Weqtakî, çavê meta Barlali Suleymanê ku heşt salan bi sedeqeteke tam, bêyî ku eniya xwe biqermiçîne ji min re xîzmet kir, demekê hat girtin. Wê jina salih, zenneke baş a ku sed dereceyî ji heddê min zêde bû, ji min kir û di derê mizgeftê de bi min girt û got **“Ji bo ku çavê min vebe, dua bike.”** Min jî, salihiya wê jina mubarek û meczûb, ji duaya xwe re kir şefaetkar û min bi Xwedê re kir zarebar: **“Ya Rebbî, tu bidî xatirê hurmeta salihbûna wê, tu çavê wê vekî.”** Roja duduyan, hekîmekî çavan ê Burdurî hat, çavê wê vekir. Piştî çil rojî, dîsa çavê wê hat girtin. Ez gelek xemgîn bûm. Min gelek dua kir. Înşallah ew dua, ji bo axreta wê hatiye qebûlkin. An na, ew duaya min, derbarê wê de, dê bibûya nifireke gelek zêde xelet. Lewre ji ecelê wê re çil roj mabûn; piştî çil rojî -Xwedê rehma xwe lê bike.- çû rehmetê.

Ha, ciyê ku wê merhumeyê, çil rojî, bi çavên rîqetî yên extiyariyê li wan rezên Barlayê temaşe bikira, wê ev qezenc kir ku di gora xwe de, bi çil hezar rojan, li wan rezên Cennetê temaşe bike. Çimkî îmana wê bi qewet bû û selaheta wê şedîd bû.

Belê, heke perde bi ser çavê mumînekî/mumînekê ve bê kişandin û ew mumîn çavgirtî daxilî gorê bibe, li gor dereceya xwe, ji ehlê mezelan zaftir dikare li wê alema nûrê temaşe bike. Li vê dunyayê çawan ku em gelek tiştan dibînin, lê belê ew mumînen ku kor in, nabînin, wisan jî di gorê de ew kesên kor, heke bi îmanê çûbin, li gor wê dereceyê, ji ehlê qebran zaftir dibînin. Mîna bi wan dûrebînen ku ciyên herî dûr, nêz nîşan didin binihêre, ew jî di mezelê xwe de, li gor dereceya xwe, mîna ku li sînemayê seyr bikin, li rezên Cennetê temaşe dikin.

Ha, çavekî wiha gelek binûr û yê ji bin axê, dikare wê Cenneta ku raserî esmanan e bibîne û li wê temaşe bike, tu dikarî di bin vê perdeya ku li ser çavê te ye de, bi şukur û sebrê bi dest bixî. **Va ye ew hekîmê çavan ku dikare wê perdeyê ji ser çavê te rake û dê, bi wî çavî bi te bide temaşekirin, Qurana Hekîm e.**

DERMANÊ PANZDEHAN

Hey nexweşê ku ax û enîn dike!

Wisan li sûretê nexweşînê menihêre û “Ax!” meke; li wateya wê binihêre û bibêje “**Ox!**” Heke wateya nexweşînê, ne tişteki xweş bûya, Xaliqê

Rehîm, ev nexweşînên ha nedida wan îbadên xwe yên ku herî zêde ji wan hez dike. Hal ku hal e, di hedîsa sehîh de heye ku:

أَشَدُّ النَّاسِ بَلَاءً الْأَنْبِيَاءُ ثُمَّ الْأَوْلِيَاءُ الْأَمْثَلُ
فَالْأَمْثَلُ - أَوْ كَمَا قَالَ -

Ango “Yên ku herî zêde dibin girîftarê musîbet û zehmetan, ew in ku di nav merivan de yên herî zêde baş û kamil in.” Di serî de Hezretî Eyyub eleyhîsselam, wan nebiyan, peyre welîyan û peyre ehlê selahetê, bi çavê îbadetekî xalis, bi çavê xelateke Rehmanî, li her yek ji wan nexweşînên ku kişandine, nihêrtine; wan di nav sebrê de şukur kiriye. Wan ew nexweşîn, weke emeliyateke cerrahî ku ji rehmeta Xaliqê Rehîm tê dîtine. **Tu, hey nexweşê/nexweşa ku ax û fîzar dike! Heke tu bixwazî bikevî nava vê qafîleya nûranî, tevî sebrê, şukur bike. Yan na heke tu gilî û gazinan bikî, ew dê te negrin nava qafîleyên xwe. Tu dê bikevî nav wan çal û kortên ehlê xefletê!.. Tu dê di rêyeke tarî de biçî.**

Belê, hinek ji nexweşînan hene, heke dawîya wan bibe mirin, ew meriv, dikeve hukmê şehîd-

bûna manewî û dibe wesîle ji şehîdiyeke ku di dereceyeke welîtiyê de ye. Mesela ew nexweşînên ku ji ber zarokanînê derdikevin, (**Haşiye**) û yên ku ji ber jan û sancoya zik, mesela bi xeniqîn û şewat û taûn/webayê wefat dikin, çawa ku şehîdê manewî ne, gelek nexweşînên mubarek hene ku dereceya welîtiyê, bi [rêya] mirinê, ji merivan re didin qezenckirin. Hem ji ber ku nexweşîn, eşqa dunyayê û eleqeya wê sivik dike, wê jihevduketina ji ber mirinê ku ji ehlê dunyayê re gelek elîm, tal û giran tê, sivik dike û heta carcaran [veqetîna ji dunyayê] dide hezkirin.

DERMANÊ ŞANZDEHAN

Hey nexweşê ku ji tengasiyê gilî û gazin dike!

Nexweşîn, di jiyana civakî ya merivahiyê de, wê hurmet û merhemeta ku herî zêde girîng û gelek xweşik e, telqîn dike. Lewre ew bi xwe, merivan ji wê îstîxnaya ku meriv sewqî hovîti û bêmerhemetiyê dike, xelas dike. Çimkî bi sirrê

Haşiye: Qezenckirina wê şehîdiya manewî ku bi vê nexweşînê çê dibe, heta wan çil rojên dema logusayê/çilî ne.

إِنَّ الْإِنْسَانَ لِرَبِّهِ لَكَنَافٍ ۖ أَنْ رَأَاهُ اسْتَغْنَىٰ¹

nefseke emmare ku dikeve wê îstîxnaya ku ji ber sihhet û afiyetê tê, li hember gelek uxuwwetên ku hêjayî hurmetê ne, hurmet nake. Û dilê wê nefsa emmare, bi wan merivên musîbetzede û nexweşketî ku şayanê merhemet û şefqetê ne, naşewite. Kengê gava ku ew bi xwe nexweş bikeve, di wê nexweşîne de, ji kêmtaqetî û neçariya xwe fam dike bi vî awayî famberî xwe dibe ku ji wan xwişk û birayên xwe yên ku layiqî hurmetê ne re, îhtîram û hurmet bike. Lê haydar dibe ku ji wan birayên xwe yên mumîn ku tîna hafa wî/wê yan jî pê re alîkarî dîkin re, hurmet bike. Ew şefqeta însanî ku ji ber şefqeta merivahiyê tê, dike ku bi wê merhemeta ku xesletekî herî girîng ê Îslamê ye, li musîbetzedeyan binihêre û wan li nefsa xwe qiyas bike û bi vî awayî, dilê wî/wê, gelek baş bi wan dişewite, li wan şefqet dike û heke ji destê wî/wê bê, bi wan re alîkarî dike. Hema qet nebe ji wan re dua dike, qet nebe, **li gor şerî'etê sunnet e ku meriv li halê wan bipirse**, ew jî diçe serdana wan û xwedanxêr dibe.

1 Bêguman meriv, xwe mustexnî dibîne û ji rê derdikeve. (Sûreyê Eleq: 6-7)

DERMANÊ HIVDEHAN

Hey nexweşê ku ji ber nexweşî nê nikare xêran bike û ji ber vê yekê jî digazine!

Şukur bike, yê ku deriyê herî xalis ê xêran ji te re vedike, nexweşîn e. Nexweşîn, tim û daîm, bi awayekî mutemadî, çawan dike ku xêr ji wan kesên nexweş re û ji wan merivên ku li nexweşan dinihêrin re bête qezenckirin, wisan jî ji bo qebûlbûna duayan, nexweşîn, wesîleyeke herî girîng e.

Belê, di nihêrtina li nexweşan de, ji bo ehlê îmanê, xêreke mezin heye. Pirsîna li halê nexweşan û bi şertê ku meriv nexweşan aciz neke serdana li nexweşan, sunneta Resûlallah e, dikeve ber gunehan û dibe keffaretê gunehan. Di hedîsê de heye ku: **“Bikin ku ew kesên nexweş, ji we re dua bikin, duaya wan meqbûl e.”** Baxusûs nexweş, gava eqreba be, nemaze gava dê û bav be, xîzmeta ji wan re, îbadetekî muhîm e; xêreke girîng e. Xweşkirina dilê nexweşan, tesellîkirina wan, dikeve hukmê sedeqeyeke muhîm û mezin. Bextiyar ew weled e ku di dema nexweşketina dê û bavê xwe de, ew, wî dilê wan ê ku zû zû xemgîn dibe, memnûn dike û xêr û duaya wan digre. **Belê, di jiyana civakî de, heqîqeteke herî muhterem, şefqeta dê û bavan e.** Li hember vê şefqeta wan, gava ku ew weledên

wan ên baş, di dema nexweşketina dê û bavê xwe de, bi hurmeteke tam û bi şefqeta xweş a ku li weledan tê, bi wê şefqetên wan re muqabele bikin, wezîyeteke wisan xweş û ‘ulwîyeteke wisan însanî li ser lewheya wefadar çê dibe ku milyaket bi xwe jî, dibêjin **“Maşellah, Barekellah”** û ji wan re li çepikan didin. Belê, di dema nexweşînê de, lezzetên gelek xweş û ferah ên ku êş û elema nexweşînê dadixîne binî û hîçiyê, hene.

Meqbûliya wan duayên nexweşan, meseleyeke girîng e. Ev bû serê sî salî ye, ji bo ku şîfa ji nexweşîneke min ku jê re qolinc tê gotin bi min re heye, bê dayîn, min dua dikir. Min fam kir ku nexweşîn, ji bo duayê hatiye dayîn. Dua, xwe bi xwe, ango ji ber ku dua xwe bi xwe ranake, ez têgihîştîm ku encama duayê, axretî ye, (**Haşiye**) ew bi xwe jî, bi awayekî ji awayan, îbadet e û meriv, bi nexweşînê, fam dike ku meriv, bêqewet e û xwe dispêre dergehê Îlahî. Ji ber wê yekê ye ku sî sal e digel ku ez duaya şîfayê dikim jî, duaya min, ji aliyê zahîrî ve qebûl nabe û nehat dilê min ku ez terka duayê bikim. Lewre nexweşîn, weqtê duayê

Haşiye: Erê, çawa ku beşek ji nexweşînan, sebebê wucûda duayê ne, gava ku dua, bibe sebebê ‘edem û çûyîna nexweşînê, hebûna duayê bi xwe, dibe sebebê tunebûna xwe, ev jî, nabe.

ye; şîfa ku heye, ne encama duayê ye. Wihareng e, belkî Cenabê Hekîmê Rehîm, gava şîfa bide, ji fezla xwe dide.

Hem gava dua, bi awayê ku em dixwazin qebûl nebe, naye gotin ku meqbûl nebû. Xaliqê Hekîm, bêhtir baş dizane, ji menfîeta me re çi bi xêr be, Ew wê dide. Yekcaran, ew wan duayên me yên ku li ser dunyayê ne, ji bo menfîetên me, vedigerîne axreta me, wisa qebûl dike. **Axirkî... Duayeke ku bi sirrê nexweşînê digihîje xalisiyê, bi taybetî ew duaya ku ji zeîfî û bêqewetiyê tê û ji zelîlî û îhtiyacan derdikeve, zaf nêzî qebûlê ye. Nexweşîn, medarê/wesîleya duayeke wiha xalis e.** Hem nexweşê/nexweşa ku dîndar e, hem ew mumînên ku li nexweşan dinihêrin jî, divê ji vê duayê îstîfade bikin.

DERMANÊ HIJDEHAN

Hey nexweşê ku dest ji şukrê berdide û dikeve gilî û gazinan!

Gilî û gazin, ji ber heqqekî/mafekî tên kirin. Ka heqq an mafekî te winda nebûye ku tu gilî û gazin dikî. Belkî li ser te gelek şukurên ku heqq in hene; îca te ew nekirin. Bi ser de jî, bêyî ku tu heqqê

Cenabê Heq bidî, tu bi awayekî neheq, mîna ku heq bixwazî gilî û gazin dikî.

Nabe ku tu, li wan kesên ku di sihhetê de, ji te çêtir in binihêrî û gilî û gazin bikî. Heta tu, berpirsiyar û mukellef î ku tu, li wan nexweşên bêçare ku di hêla sihhetê de ji te xerabtir in binihêrî û şukur bikî. **Heke destê te şikestî be, li wan destên birîtî binihêre! Ku çavekî te tune be, li wan ‘amayên ku her du çavên wan jî tune ne binihêre. Ji Xwedê re şukur bike!** Erê, heqqê tu kesî tune ye ku li wan kesên ku di hêla nîmetan de jê çêtir in binihêre û gilî û gazin bike. Îca di musîbetê de, heqqê her kesî ew e ku li wan kesên di hêla musîbetê de jê xerabtir in binihêre û şukur bike. Ev raz, di hin rîsaleyan de bi temsîlekê hatiye ravekirin. Kurtebêjiya wê ev e:

Zatek, bêçareyekî derdixê serê mînareyekê. Di her pêlpêlikeke mînareyê de, îhsanên cihê cihê û xelatan didiyê. Tam li serê mînareyê, xelateke herî mezin didiyê. Îca ew, digel ku li hember wan xelatên cihê cihê li benda spasê ye û jê minetdarî dixwaze, ew merivê har û no, temamê wan xelatên ku di wan pêlingan de dîtine, jibîra dike, yan jî qet bi tiştekî nahesibîne, şukur nake û li jorê dinihêre û dibêje: “Xwezî ev mînare dirêjtir bûya, ez hîna jî derketima jorê! Ka çima ev wisan mîna çiya, ne bilind e, yan jî

bi qasî mînareya dî ne bala ye?” û gava bi vî awayî dest bi gilî û gazinan bike, de ka ev çiqas kufranê nîmet e, çi neheqiyek e! Wisan jî, digel ku merivek, ji hîçiyê hatiye wucûdê û nebûye kevir, nebûye dar û heywan nemaye, bûye meriv û bûye misilman û gelek deman sihhet û afiyet dîtiye û bi vî awayî dereceyeke bilind a nîmetê qezenc kiriye jî, îca gava ji ber hinek arize, terîbîn û zedeyan nebe layiqê hin nîmetên mîna sihhet û afiyetê, yan jî ji ber wan su-î îxtiyarên wî yan jî ji ber wan îstîmalên wî yên nebaş, gava wê sihhet û afiyetê winda bike, yan jî gava ji ber ku destê wî nagihîjê, rabe gilî û gazinan bike û bêsebrîyê nîşan bide û bibêje “Hawar! Min çi kir ev wisan hat serê min?” û bikeve rewşeke ku rubûbiyeta Îlahî tenkîd dike, wê gavê ew nexweşîna wî ya manewî, ji nexweşîneke maddî bêhtir bi musîbet e. Mîna ku bi destê xwe yê şikestî şer bike, bi wan gilî û gazinan, nexweşîna xwe zêde dike.

Yê/ya bi aqil ew e ku bi sirrê

لِكُلِّ مُصِيبَةٍ إِنَّا لِلَّهِ وَإِنَّا إِلَيْهِ رَاجِعُونَ¹

teslîm bibe, sebir bike; da ku ew nexweşîn, wezîfeya xwe biqedîne, biçe...

1 Gava mûsîbetek tê serê wan, dibêjin: “Em ji bo Xwedê ne û em dê dîsa ber bi Wî ve vegerin. (Sûreyê Beqere: 156)

DERMANÊ NOZDEHAN

Tabîra Semedanî ya “**Esmayê Husna**” nîşan dide ku hemû navên Cemîlê Zulcelal xweşik in. **Di nav mewcûdan de, ew ‘eyneya herî letîf, herî xweşik, herî camî’ ya Semediyetê jî, jiyan e.** ‘Eynika/mirêka xweşikan xweşik e. ‘Eynikên ku mehasinên xweşikan nîşan didin, ew bi xwe jî xweşik dibin. Çi tiştê ku ji wê xweşikiyê bê serê wê ‘eynikê, çawan ku xweşik e, çi tiştê ku bê serê heyatê bi xwe jî, di hêla heqîqetê de xweşik e. Çimkî neqîşên xweşik ên Esmaul Husna yên ku xweşik in nîşan didin.

Jiyan, gava ku daîma di sihhet û afiyetê de bi yeknesakî/yekawayî biçe, dibe ‘eynikeke naqis û kêr. Heta bi awayekî ji awayan, dike ku ‘edem, tunetî û hîçî bête bîra meriv û meriv bitengije. Qîmeta jiyanê kêr dike. Lezzeta ‘imir, li tengasiyê werdigerîne. Ji ber ku dikeve ber bayê “Ka ez dema xwe zû derbas bikim” û bi vî awayî ji ber diltengiyê, radibe, yan xwe davêje sefîhiyê, yan jî berê xwe dide kêf û şadiyan. Mîna muddetê hebsê, neyartî bi ‘imrê xwe yê qîmetdar re dike û dixwaze ku wî zû bikuje û derbas bike.

Îca jiyanê ku di tehawwul, guhertin û tevgerê de ye û di nav helwestên cihê cihê de digevize, qîmeta xwe dide hesandin, girîngî û lezzeta ‘imir

dixe bîra merivan. Qendera di meşeqqet û musîbetê de be jî, naxwaze ku ‘imir derbas bibe. Nabêje “Hawar roj neçû ava, yan şev neqediya.” Û ji diltengiyê nake “**Ofeof!**” Belê, gava ji efendiyeke gelek dewlemend ê bêîş û betal ku li ser binraxa/ doşeka îstrehetê ye û her tiştê wî mukemmel e bê pirsîn “Halê te çi ye?” helbet gotinên bielem ên mîna “Hawar weqt derbas nabe; hele were em şeş-bêşekê bilîzin.” Yan jî “Were ji bo ku em weqt derbas bikin, em ji xwe re şahiyekê bikin.” tu dê ji wî bibihîsî. Yan jî, ew gilî û gazine mîna “Ha ev îşê min kême; xwezî min ev karê ha jî bikira.” ku ji tûlê emelê tên tu dê bibihîsî û bibînî.

Îca ji yekî musîbetzede yan ji karkerekî yan jî ji belengazekî ku di rewşeke bimeşeqqet de ye tu bipirse:

“Halê te çi ye?”

Ku aqilê wî li serê wî be, dê bibêje ku:

“Şukur ji Rebbê min re be. Ez baş im, dixebitim. Xwezî roj zû neçûya ava, min bikaribûya ev karê xwe jî biqedanda! Weqt zû derbas dibe, ‘imir nasekine; diçe. Yekcaran zehmetê dikşînim; lê belê ev jî dê derbas bibe, her tişt wisan zû dibihure.” Ha ew, bi vî awayî û bi xemgîniya derbasbûna ‘imir, nîşan dide ku ‘imir, ji aliyê manewî ve çendîn hêja

ye. Nexwe bi xêra zehmetî û xebatê, bi lezzeta ‘imir û bi qîmeta jiyane dihesa û fam dike. Îca îstrehet û sihheta ku hene, ji ber ku tehma ‘imir tehl dikan, (meriv) dixwaze ku ‘imir zû derbas bibe.

Hey xwişk û birayên nexweş!

Bizanin, çawa ku di rîsaleyan din de bi berfirehî û bi awayekî qet’î hatiye îsbatkirin, esl û havênê/ mayeya musîbet û şeran, hetta ya gunehan, ‘edem û tûnetî ye. ‘Edem û tûnetî jî, şer e, tarîfî ye. Rewşên mîna wê îstrehetê yeknesak, sukût, sukûnet û sekinandinê, ji ber ku nêzî ‘edem û hîçiyê ne, ew wê tarîfîya di ‘edemê de dixin bîra meriv û dikan ku meriv dilteng bibe. Îca tevger û tehevwul ku hene, wucûd in, wucûdê tînin bîra meriv. Wucûd ku heye, xêra xwerû û xalis e, nûr e.

Himin rastî ev e, ew nexweşîna bi te re, ji bo gelek wezîfeyên mîna ku wê jiyana hêja safî bike, qewî bike, bixe tereqqî û pêşveçûnê û ji bo ku wan cîhazên din ên însanî yên wucûda te, li dora wî azayê te yê nexweş, bi awayekî muawenetdar/ alîkar bide gerandin û ji bo ku neqîşên wan îsmên cihê cihê yên Sani’ê Hekîm nişan bidin (ji bo gelek wezîfeyan) ew nexweşîna bi mêvanî ji wucûda te re hatiye şandin. Înşallah wezîfeya xwe zû diqedîne dîçe. Û ji afiyetê re dibêje: Înşallah dê wezîfeya xwe

zû biqedîne biçe. Û dê ji afiyetê re bibêje: “Tu were, di cîyê min de daîmî bimîne, wezîfeya xwe bike. Ev xane, xaneya te ye, bi afiyetê tê de bimîne.”

DERMANÊ BÎSTÎ

Hey nexweşê ku ji bo derdên xwe li dermanan digere!

Nexweşîn du qism e. Qismek jê **heqîqî**; qismek jî **wehmî/dilxuûşî** ye.

Qismê heqîqî, Şafîyê Hekîm ê Zulcelal, di ecza-xaneya xwe ya kubra ku kureya erdê ye de, ji her derdî re dewayek/dermanek îstîf kiriye û cî dayê ye. Ew derman ku hene, “derd”an divên. Wî ji her derdî re dermanek xuluqandiye. Ji bo tedawiyê, meşrû/rewa ye ku meriv îlacan bigre/bistîne, bi kar bîne. Lê belê divê meriv tesîr û şîfayê, ji Cenabê Heq bizanibe. Çawan ku Ew derman dide, şîfayê jî Ew bi xwe dide.

Îlaceke girîng ew e ku meriv li gor tewsiyeyên wan hekîmên bimeharet, pispor, bibehre û dîndar tevbigere. Lewre piraniya nexweşînan, ji ber sûtî îstîmalan, ji bêperhîziyan, ji îsrafê, ji xetayan, ji ber sefahetan û ji ber guhdarînekirinan tên. Hekîmê dîndar, helbet di daîreyeke meşrû/rewa de nesîhet

dike û tewsiyeyan dike. Dike ku pêşî li ber îstîmalên nebaş û îsrafan bigre û nexweşan tesellî bike. Nexweş, baweriya xwe bi wan tewsiye û wê teselliyê tînin, bi vî awayî nexweşîna wî kesê/wê kesa nexweş sivik dibe; di ciyê diltengiyê de dilxweşî dide.

Îca ji qismê wan nexweşînên pêjnî/dilxuşûşî re, îlaca herî bitesîr ew e ku meriv guh nediyê. Her ku meriv girîngî didê, ew mezin dibe, diwerime/diperpîxe. Ku girîngî pê neye dayîn, biçûk dibe, ji hev belav dibe. Çawan gava meriv têkilî mêş û mozan bibe, ew jî bi ser serê meriv de radiweşin; lê belê gava meriv guh bi wan neke, belav dibin. Hem di tarîyê de gava ku benek li hewa biheje û bi ber çavê meriv bikeve, dibe weke xeyalet û her ku meriv girîngiyê bide wê xeyalê, ew jî mezin dibe. Hetta yekcaran meriv ji ber tirsan, mîna dîwaneyan diqîre; lê belê gava ku meriv girîngî pê nede, dê bibîne ku benekî wisa beredayî, ne mar e û îca bi wê metirsî û qilqilîna serê xwe dikene. Ku ev nexweşîna dilxuşûşî zaf dewam bike, dibe rastî. Ev ku heye, di wan merivên dilbixuşûş û esebî de, nexweşîneke gelek fena û no ye. Hebbeyê dike qubbe; ji ber wî qewweta wî/wê ya manewî dişkê. Nexasim gava rastî wan hekîmên nîvco yên bêmerhemet an jî gava rastî wan doktorên bêînsaf bîn, wisan dikin ku ew dilxuşûşîya wî zêde bibe.

Ku dewlemend be, malê wî diçe; heke na îca yan aqilê wî diçe, yan jî sihhet pê re namîne.

DERMANÊ BÎST Û YEKÊ

Hey birayê nexweş!

Di nexweşîna te de, elema maddî heye; lê belê lezzetêke girîng a manewî ku tesîra wê elema maddî ji holê dê rake, dor li te girtiye. Lewre heke dê û bav û eqrebayên te hebin, ew şefqetên wan ên gelek bilezzet ku te ji zû ve ew jibîra kirine, ji nû ve li dora te hişyar bûne û ew nihêrtinên/meyizandinên wan ên şîrîn ku te di dema zarokatiyê de didît, dîsa li ber serê te ne. Tevî vê yekê, ew dostaniyên ku li derdora te gelek nepenî û bi perde mane, bi cazîbeya nexweşîna te, dîsa bi awayekî muhebbetdarî/hezkiroxî li te dinihêrin. Ji ber vî awayî, helbet ev elema te ya maddî, li ber wan, gelek erzan dibe.

Hem ew zatên ku te ji wan re bi muftexîrî xîzmet dikir û te hewl dida ku tu îltîfata wan qezenc bikî, ji ber nexweşîna te, ji te re bi awayekî merhemetkarî xîzmet dikin û tu, bi vî awayî ji efendiyên xwe re bûy efendî.

Hem ji ber ku te, rîqqeta cinsî û şefqeta new'î ya merivan ber bi xwe ve kişand, qet nebe te gelek alîkarên ehabab û dostên bişefqet dîtin.

Hem bi xêra nexweşînê, te ji gelek xîzmetên bizêhmet, emrê paydosê girt û îca tu îstrehet dikî. Helbet ev elema te ya cuzî, li hember van lezzetên manewî, divê te ne sewqî gîlî û gazinan bike; belê divê te sewqî teşekkur û spasê bike.

DERMANÊ BÎST Û DUDUYAN

Hey birayê nexweş ku bûye mubtelayê wan nexweşînen giran ên mîna nuzûlê/şehtê!

Serê pêşî ez mizgîn didim te ku ji bo mumînan şîl û şehtî, mubarek tê hesabandin. Ji zû ve ku min ev, ji ewliyayan dibihîst; îca min bi raza wî nedizaniya. Razeke/sirreke wê, wiha tê ber dilê min ku: Ehlullah, ji bo ku bigihîjin Cenabê Heq û ji bo ku ji talûkeyên manewî yên mezin ên dunyayê xelas bibin û ji bo ku seadeta ebedî temîn bikin, bi zanetî û dilxwazî wan xwe daye pey du esasan:

Yek jê: Rebitaya mewtê ye. Ango çawan ku dunya fanî ye, ew jî fikirîne ku li vê dunyayê, mêvanekî fanî yê wezîfedar in û bi vî awayî ji bo heyata xwe ya ebedî xebitîne.

Ê duduyan: Ji bo ku ji nefsa emmare û ji hestên xwe yên kor xelas bibin, bi “çil”eyan, bi rîyazetan, wan hewl daye ku nefsa emmare bikujin.

Gelî bira û xwişkên ku we, sihheta nîvê wê wucûda xwe winda kiriye! Du esasên kurt û hêsa ku wesîleya seadetê ne, bêyî ku tu bixwazî ji te re hatine dayîn ku; rewşa wucûda te, daîma dixe bîra te ku zewala dunyayê heye û meriv jî fanî ne. Êdî dunya nikare te bifetisîne, xeflet jî nikare çavê te bigre. Îca nefsa emmare ku heye, bi hewesên rezîl û îştêhên nefsanî, nikare zatekî ku bûye nîv-wucûdî bixapîne; bi vî awayî ji belaya wê nefsê zû xelas dibe.

Ha, mumîn, bi sirrê îmanê û bi teslîmîyetê û bi tewekkulê, dikare ji wê nexweşîna giran a mîna şil û şehtiyê, di demeke kurt de, mîna “çil”eyên ehlê welîtiyê, îstîfade bike. Wê gavê ew nexweşîn, gelek erzan tê.

DERMANÊ BÎST Û SISÊYAN

Hey nexweşê bêkes, xerîb û bêçare!

Bi nexweşîna te, bêkesî û xurbet, dike ku li hember te, ew dilên herî hişk jî, nerm bibin û bi çavê şefqetê li te binihêrin, îca gelo, ew Xaliqê te yê Rehîm ku di serê temamê wan sûreyên Quranê de xwe bi sifeta **“Rehmanur Rehîm”** teqdîmî me dike û ku Ew, bi yek lem’eyeke şefqeta xwe, temamê wan dayikan, li ber weledên wan, bi wê şefqeta xwe ya

newaze dide terbiyekirin û perwerdekirin û ku Ew, her biharê, bi cilweyeke rehmeta xwe, rûyê erdê, bi nîmetan dadigre û ew Cenneta/Bihuşt li heyateke ebedî, bi temamê mehasinên xwe ku cilweyek ji rehmeta Wî ye, gava tu îman pê bînî û pê întisab bikî û Wî nas bikî û bi zimanê neçarî yê nexweşîna xwe niyaz bikî, helbet ev nexweşîna te ya bêkesî ya li xurbetê, di berdêla her tiştî de, dê berê çavê rehmeta Wî, bikşîne ser te.

Madem Ew heye û li te dinihêre, helbet a niha ji te re her tişt heye. Ew merivên ku li xurbeta bi xwe ne, bi rastî jî di bêkesîtiyê de dimînin ew in ku bi îman û teslîmbûnê întisabî Wî nakin an jî girîngî nadin întisaba Wî.

DERMANÊ BÎST Û ÇARAN

Gelî kesên nexweşnihêr ku ji zarokên masûm ên nexweş re û ji wan pîrûkalên ku di hukmê zarokên masûm de ne re xizmet dikin!

Li ber we, tîcareteke/bazirganiyeke girîng a axretî heye. Bi şewq û xîretê, hewl bidin ku hûn wê bazirganiyê qezenc bikin.

Ji aliyê ehlê heqîqetê ve sabit e ku **nexweşînên wan zarokên masûm**, ji bo wê wucûda wan a

nazik, weke îdmanekê, riyazetekê û ji bo ku di rojên pêş/bê de, li hember zehmetiyên dunyayê li ber xwe bidin, weke şiringeyekê û weke terbiyeyeke Rebbanî, tên dayîn. Gelek hîkmetên ku li jiyana dunyayî ya zarokan dinihêrin, di van nexweşînên zarokan de hene. Tevî vê yekê, ji bo heyata wan a rûhî û ji bo safîbûna heyata wan, baş e. Çawan ku nexweşîn, ji mezinan re dibe kefarete gunehan, ji zarokan re jî, di hêla manewî de, di rojên pêş/bê de yan jî li axretê, ji tereqqiyên wan ên manewî re dibe navgîn, wisan jî ew nexweşînên ku şiringe ne û ew xêra ku ji wan tê, li deftera ‘emel a dê û bavên wan tê nivîsandin, xusûsî jî, dikeve rûpelê xêrên wan dayikan ku bi sirrê şefqetê, sihheta weledê xwe tercîhî sihheta xwe dikin.

Îca nihêrtin û xwedîderketina li pîr û kalan jî, digel ku meriv xêreke mezin digre, heke meriv duayên wan extiyaran bigre, -îca nemaze gava ew pîr û kal, dê û bavên meriv bin- ku meriv dilê wan xweş bike, bi awayekî wefadarî ji wan re xîzmet bike, bi rîwayetên sehîh û bi gelek bûyerên dîrokî sabit e ku ji bo meriv hem dibe medarê seadeta vê dunyayê hem jî ji seadeta meriv a axretê re dibe wesîle. Bi gelek bûyeran sabit e ku weledekî bexteyar ê ku bi awayekî tam, îtaetî dê û bavê xwe yê extiyar dike, ji weledên xwe eynî wezîyet û helwestê dibîne, îca

weledêkî bêbext, gava dê û bavê xwe rencîde bike, ji bilî ezabê axretê, li dunyayê jî rastî gelek felaketan tê û cezayê xwe dibîne.

Belê, pêdiviyêke Îslamê ye ku meriv baş li extiyar û masûman binihêre, heta ne tenê li wan kesên ku eqreba be binihêre, -madem bi sirrê îmanê, uxuwweta heqîqî heye- gava ehlê îmanê rastî wan bê û ew nexweşê muhterem ê extiyar, gava ku muhtac be, divê ku meriv, ji wan re, bi dil û can xizmet bike.

DERMANÊ BÎST Î PÊNCAN

Gelî xwişk û birayên nexweş!

Hûn heke tilyakeke ku gelek bimenfîet e û ji her derdî re dewa û dermanê heqîqî ye, bi tehm e û qudsî ye bixwazin, **îmana xwe bidin înkîşafkirin**. Ango bi tobe û îstîxfarê û bi nimêj û ûbûdiyetê, wê îmana ku tiryaka qudsî ye û wê îlaca ku ji îmanê tê, bi kar bînin.

Belê, ehlê xefletê ji ber ku ji dunyayê hez dikin û bi dunyayê re eleqedar in, tu dibêjî qey wucûdeke manewî ya ku bi qasî dunyayê mezin e û nexweş e ji wan re heye. Me di gelek rîsaleyan de bi awayekî qet'î îsbat kiriye ku îman, ji derbeyên zewal û

fîraqê ku bi qasî dunyayê ne re û ji wê wucûda te ya manewî ku di nav kul û birînan de ye, ji nişka ve dibe şîfa û wê wucûdê, ji wan kul û birînan xelas dike û şîfayeke heqîqî didê. Ji bo ku ez serê we neêşînim, kurt dibirim.

Îca îlaca îmanê meriv bi qasî qederê îmkanan, bi tobe û ferzan bîne cî, tesîra xwe nişan dide. Xeflet û sefahet û hewesên nefsanî û lewhiyatên nemeşrû, tesîra wê tiryakê/tilyakê asteng dikin. Nexweşîn, madem xefletê radike, îştah û şehwetê dibire, pêşî li ber çûna wan kêfên ne-meşrû digre, ji wê îstîfade bikin. Ji îlac û nûrên qudsî yên îmana heqîqî îstîfade bikin û bi tobe û îstîxfarê, bi dua û niyazê îstîmal bikin.

Cenabê Heq, şîfa bide we û wan nexweşînên we bike kefarete gunehan. Amîn, amîn, amîn!..

الْحَمْدُ لِلَّهِ الَّذِي هَدَيْنَا لِهَذَا وَمَا كُنَّا لِنَهْتَدِيَ
لَوْلَا أَنْ هَدَيْنَا اللَّهُ لَقَدْ جَاءَتْ رَسُولُ رَبِّنَا بِالْحَقِّ¹

1 Dibêjin ku: Hemd ji Xwedê re be ku Wî ev ji me re kir nesîb. Heke Xwedê em hîdayet nekiribana, me nikaribû ji berî xwe ve rêya rast bidîta. Sond be, qasidên Rebbê me, li ser heqqiyê ne û bi heqqiyê hatine. (Sûreyê E'raf: 43)

سُبْحَانَكَ لَا عِلْمَ لَنَا إِلَّا مَا عَلَّمْتَنَا
إِنَّكَ أَنْتَ الْعَلِيمُ الْحَكِيمُ¹

اَللّٰهُمَّ صَلِّ عَلَى سَيِّدِنَا مُحَمَّدٍ طِبِّ الْقُلُوْبِ وَ
دَوَائِهَا وَعَافِيَةِ الْاَبْدَانِ وَشِفَائِهَا وَنُوْرِ الْاَبْصَارِ
وَضِيَائِهَا وَعَلَى اٰلِهِ وَصَحْبِهِ وَسَلِّمْ²



1 Em ji hemû sifetên kême Te tenzîh dîkin. Ji xeynî tiştê ku Te hînî me kiriye, tu ilmekî me tune ye. Bê guman Tu baş bi her tiştî dizanî û Tu xwedî hikmetê yî. (Sûreyê Beqere: 32)

2 Ya Rebbê min, selat û selam li ser wî mezinê me Muhemmed be ku ew tîbb û dermanê dilan e û afiyet û şîfaya bedenê û nûr û ronahiya çavan e. Û selam li ser al û sehabiyên wî be jî.

Nameya Hivdehan

(Zeyla Lem'eya Bîst û Pêncan)

TAZIYENAMEYA ZAROKAN

(Hawarînameya Zarokan)

بِسْمِهِ وَإِنْ مِنْ شَيْءٍ إِلَّا يُسَبِّحُ بِحَمْدِهِ¹

Birayê min ê axretê yê ezîz Hafîz Xalîd Efendî!

بِسْمِ اللَّهِ الرَّحْمَنِ الرَّحِيمِ²
وَبَشِّرِ الصَّابِرِينَ ﴿الَّذِينَ إِذَا أَصَابَتْهُمْ مُصِيبَةٌ قَالُوا إِنَّا لِلَّهِ وَإِنَّا إِلَيْهِ رَاجِعُونَ﴾³

1 Tu tişt tune ye ku digel hemdkirinê, Wî tesbîh neke (Îsra: 44)

2 Bi navê wî Xwedayê Rehman û Rehîm.

3 Mizgîn bide wan ên ku sebir dîkin. Gava mûsîbetek tê serê wan, dibêjin: “Em ji bo Xwedê ne û em ê ber bi Wî ve vegerin. (Sûreyê Beqere: 155-156)

Birako, wefata gedeyê te, ez muteessîr û xemgîn kirim. Lê belê **الْحُكْمُ لِلَّهِ** şîareke Îslamê ye ku meriv bi qezayê razî be û ji qederê re teslîm bibe. Cenabê Heq sebra cemîl bide we. Min hêvî ji Xwedê heye ku Ew, wî rehmetîyî jî, ji we re bike zewadê axretê û şefaetkar. Em dê **“Pênc Nuqte”** yên ku ji we re û ji wan mumînên mîna we mutteqî re mizgîneke mezin û teselliyeke heqîqî nîşan bide, beyan bikin.

NUQTEYA YEKÊ: Di Qurana Hekîm de, sir û meala ¹ **وَلَدَانُ مُخَلَّدُونَ** ev e ku:

Ev ayeta kerîm bi cumleya xwe ya

وَلَدَانُ مُخَلَّدُونَ

îşaret dike û mizgîn dide ku ew weledên mumînan ku berî balixbûnê wefat dikin, li Cennetê, bi awayekî ebedî û şîrîn û bi awayekî ku layiqî Cennetê bin, dê daîmî zarok bimînin.

Û di hemêza wan dayik û bavên ku diçin Cennetê de, dê ebedî bibin medarê kêfxweşiya wan..

1 Zarokên ku gihîştine heyata ebedî. (Sûreyê Waqîe: 17)

Û zewqeke herî letîf ku hezkirina ji zarokan û şabûna bi wan e, ji dê û bavên xwe re dê bibin wesîleya temînê.

Û her çi tiştê ku bi lezzet be, li Cennetê heye. Ew kesên ku dibêjin “Ji ber ku Cennet, ne ciyê tenasulê ye, li wê derê hezkirina ji zarokan û şabûna bi zarokan tune ye.” ne rast e..

Hem li ciyê şabûn û hezkirina bi zarokan ku bi eleman dagirtiye û di demeke kurt a deh salên vê dunyayê de ye, ehlê îmanê, dê hezkirin û şabûneke ebedî ya bi qasî milyon salan û safî û bê elem, qezenc bike û ew ayeta kerîm destnîşan dike ku ev wesîleyeke seadetê ya herî mezin e ji bo ehlê îmanê.

NUQTEYA DUDUYAN: Zemanekî, zatek di zindanekê de ye. Wan, zarokekî wî yê xwînşîrîn jî şandiye cem wî. Îca ew girtiyê bêçare, hem di bin barê elema xwe de ye, hem jî ji ber ku nekariye îstreheta wî weledê xwe temîn bike, dilê wî diêşe û gelek dilbikûl e. Peyre hakimê merhemetkar, merivekî dişîne ba wî û dibêje ku:

“Ev gede, her çendî ewladê te ye; lê belê raiyeta min e û miletê min e. Ez dê wî bigrim (ba xwe) û di serayeke xweşik de xwedî bikim.”

Ew mêrik digrî, digazine û dibêje: “Ez dê weledê xwe yê ku medarê teselliya min e, nedim.”

Hevalên wî jê re dibêjin:

“Ev xemgînî, qîlqîlîn û pirpitîna te, beredayî ye. Heke tu, bi ber weledê xwe dikevî, ew gede bedêla ku bête ba bavê xwe û bikeve vê zindana teng, genî û gemarî, dê biçê serayeke fireh û bi seadet. Heke tu ji bo nefsa xwe xemgîn dibî, heke tu li menfîeta xwe digerrî, gava gede li vê derê bimîne, digel ku tê de menfîeteke te ya demborî û biguman dê hebe jî, îca dibe ku tu, ji ber zehmetiyên wî gedeyî, bikevî gelek diltengîyê û tu dê gelek eleman bikşînî. Îca gava gede biçê wê derê, hezar menfîetên wî ji te re hene. Lewre dibe wesîle ku merhemeta wî padîşahî bikşîne ser te û ew ji te re bibe wekî şefaetkar. Padîşah, dê bixwaze ku tu û wî hev bibînin. Ji bo hevdîtînê, helbet dê wî neşîne zindanê; belkî ew te ji zindanê derxe û bikşîne wê serayê, bike ku tu û wî hev bibînin. Bi vî şertî ku tu bawerî bi padîşahî binî û jê re îtaet bikî...”

Ha mîna vê mînakê, hey birayê min ê ezîz, gedeyên wan mumînên mîna te, dema wefat dikin, divê ew wiha bifikirin: “Ev weled masûm e. Xaliqê wî jî, Rehîm û Kerîm e. Di ciyê terbiye û şefqeta min a naqis/kêm de, Wî ew girt ber wê înayet û rehmeta xwe ya gelek kamil. Wî bi xwe, ew gede ji zindana bielem, bimusîbet û zehmet a dunyayê derxist û şand Cennetul Fîrdewsa xwe. Xwezî bi wî

zarokî! Ku li vê dunyayê bimaya, kî dizane ka dê biketa çi halî. Ji ber wê yekê, ez pê naêşim, ez wî bextewar dizanim.”

Îca ew aliyê ku menfîeta nefsa min tê de heye, gunehê min, bi min jî naye, pir elîm û xemgîn nabim. Lewre ku li dunyayê bimaya, wî dê hezkirineke ewladî ya dehsalî ku demborî û tevî eleman e, ji min re temîn bikira. Ku salih bûya û di karûbarên dunyayê de pêkhatî û jêhatî bûya, dibe ku bi min re alîkarî bikira. Lê belê bi wefata xwe, ew li Cenneta ebedî, dibe medarê wê hezkirina ewladî ya deh milyonan salan û bi ser de jî, dikeve hukmê şefaetkarekî ku ji seadeta ebedî re bibe wesîle. **Helbet û helbet, kesê ku menfîeteke tije şik û guman û mu’eccel winda bike; lê belê menfîeteke muheqqeq û muccel qezenc bike, xemgîniyeke tije elem nîşan nade; bi awayekî bêhêvî nake feryad.**

NUQTEYA SISÊYAN: Zarokê ku wefat kir, mexlûqek û memlûkek û ebdekî Wî Xaliqê Rehîm bû û bi hemû rewş û halên xwe, mesnû’ekî Wî bû û aîdê Wî bû, mîna hevalekî, ji bavê xwe re bi demborî hatiye dayîn ku lê binihêre. Wî bi xwe, dê û bav, jê re kirine xîzmetkar. Di muqabilê wê xîzmeta wan de, weke ucreteke mu’eccel, Wî şefqeteke bilezzet daye wan. A niha, ew Xaliqê Rehîm ku ji hezarî,

xwedî paya nehse û not û nehan e, ji ber pêdiviya rehmet û hîkmetê, gava wî zarokî ji destê te bigre, dawî li xizmeta te bîne, [tu rabî xwe ne qail bikî û] bi “yek” hîsseyeke şeklî, li hember Wî xwediyê ku hezar hîsse aîdê Wî ye, gili û gazinan bikî û bi awayekî bêhêvî xemgîn bibî û feryad bikî, [îca ev ku heye] li ehlê îmanê naye, hebe hebe, ev ancax bi ehlê xeflet û ehlê dalaletê dikeve.

NUQTEYA ÇARAN: Heke dunya ebedî bûya, meriv jî tê de ebedî bimaya û firaq jî ebedî bûya, dibû ku meriv biketa wan xemgîniyên elîm û wan dilşewatîyên hêvînemayî. Lê belê, madem dunya, mêvanxaneyek e, ew zarokê ku wefat kiriye, çûbe kê derê, hûn jî, em jî, dê biçîne wê derê. Û hem ev wefat, ne xasî wî ye; caddeyeke umûmî/gîştî ye. Hem madem jihev-veqetîn bi xwe jî, ne ebedî ye, li pêş, hem li berzexê, hem li Cennetê, dê hevdîtin çê bibe. Divê meriv bibêje ¹ **اَلْحَمْدُ لِلّٰهِ** Wî da, Wî girt. Divê meriv digel sebirê şukur bike û bibêje

اَلْحَمْدُ لِلّٰهِ عَلَى كُلِّ حَالٍ²

1 Hukum, eydê Xwedê ye. (Sûreyê Mumîn: 12)

2 Li ser hemû hal û rewşî hemd ji Xwedê re be. (Hedîs. Ebû Dawud, Edeb: 91)

NUQTEYA PÊNCAN: Şefqet ku ji wan cilwe-
yên herî letîf, herî xweşik, herî xweş, herî şîrîn ên
Rehmeta Îlahî ye, îksîrekî nûranî ye. Ji eşqê gelek
zêde tûjtir û hêzdartir e. Dibe wesîleya zûgihîştina
Cenabê Heq. Çawan ku eşqê mecazî û eşqê dunyayî,
bi gelek zehmetiyan werdigerin eşqê heqîqî û ew
aşiq, digihîjin Cenabê Heq. Wisan jî, şefqet -îca bê
zehmetî- bi awayekî kurt-tir, safîtir dike ku dil bi
Cenabê Heq ve bête girêdan.

Çi dê be çi bav be, bi qasî temamê dunyayê ji
weledê/weleda xwe hez dike. Gava weledê wan ji
destê wan tê girtin, heke bextewar be, heqîqî ehlê
îman be, berê rûyê xwe ji dunyayê badide, Mun'îmê
Heqîqî dibîne. Dibêje ku: **“Dunya madem fanî ye,
ne hêjayê eleqedariya dilan e.”** Weledê/a wan çûbe
kê derê, ew jî êdî berê bal û eleqeya xwe didin ser
wê derê, halekî mezin ê manewî qezenc dikan.

Ehlê xeflet û dalaletê, ji vê seadet û mizgîna ku
di van Pênc Heqîqetan de ye, marûm in. Halê wan
çi qas elîm e, hûn bi vê qiyas bikin ku: Xanîmekê
pîr, gava zarokekî xwe yê şîrîn, di sekeratê de
dibîne, ji ber ku tewehhuma ebedîbûnê ji dunyayê
dike û ji ber encama xeflet û dalaletê, ji ber ku ew,
mirinê weke ‘edem û veqetîna ebedî tesewwur
dike, li hember vê doşeka nerm, axa gorê tê bîra
wê. Ji ber aliyê xwe yê xeflet û dalaletê, ew dayik,

nikare wê Cenneta rehmet û Fîrdewsa nîmet a **Erhemurrahîmîn** bine bîra xwe. De îca ev dayika wiha, ketiye xemgîniyeke çiqas bêhêvî û çi elemeke ecêb dikşîne, tu dikarî qiyas bikî.

Îca îman û Îslama ku ji seadeta dareyn re wesîle ne, ji merivên mumîn re dibêje ku: “Xaliqê Rehîm ê vî zarokê ku di sekeratê de ye, dê wî ji vê dunyaya pîs derxe û bibe Cenneta xwe. Hem ji te re dê bike şefaetkar, hem jî dê bike ewladekî/sebiyekî ebedî. Mufereqet, muweqqet e, mereq meke. Bibêje

الْحُكْمُ لِلَّهِ * إِنَّا لِلَّهِ وَإِنَّا إِلَيْهِ رَاجِعُونَ¹

û sebir bike.

الْبَاقِي هُوَ الْبَاقِي

Seîdê Nûrsî



1 Hukum, eydê Xwedê ye. (Sûreyê Mumîn: 12) * Em ew ebdên ji bo Xwedê ne û dîsan jî em dê ber bi Wî ve vegerin. (Sûreyê Beqere: 156)

Lem'eya Duduyan

¹ بِسْمِ اللَّهِ الرَّحْمَنِ الرَّحِيمِ

² إِذْ نَادَى رَبَّهُ أَنِّي مَسَّنِيَ الضُّرُّ وَأَنْتَ أَرْحَمُ الرَّاحِمِينَ

Ev Munacata Hezretî Eyyûb eleyhîsselam ku lehengê sebrê ye, hem tecrûbekirî ye, hem bi bandor e. Lê belê bi awayê jêgiriya ji ayetê divê em di munacata xwe de bibêjin

³ رَبِّ إِنِّي مَسَّنِيَ الضُّرُّ وَأَنْتَ أَرْحَمُ الرَّاحِمِينَ

Kurtebêjiya wê qisseta navdar a Hezretî Eyyûb eleyhîsselam ev e:

1 Bi navê Xwedayê Rehman û Rehîm

2 Ka wî (Eyyûb eleyhîsselamî) wiha bi Rebbê xwe re kiribû zarebar: Bêguman zerar gihîşte min. Tu, ew î ku merhemeta te, ji merhemeta temamê merhemetkaran zêdetir e. (Enbiya: 83)

3 Ya Rebbî, êdî zerar gihîşt min. Tu, ew ê herî bimerhemet ê xwedî merhemetan î.

Her çendî, ew di rewşeke nava birîn û bere de zaf mabû jî, bi wê fikra mukafata mezin a wê nexweşînê, bi kemala sebrê tehemmul kiriye û xwe ragirtiye û maye. Piştî ew kurmên ku ji birînên wî çê dibin, gava digihîjin dil û zimanê wî, îca dil û zimanê wî, ji ber ku ciyê zikir û merîfeta Îlahî ne, ji ber tîrsa ku dê zerar bigihîje wê wezîfeya ûbûdiyetê, ne ji bo îstreheta xwe, belkî ji bo ûbûdiyeta Îlahî gotiye: “Ya Reb! Zerar gihîşt min, ji aliyê zimanî ve zerar dide zikrê min û ji aliyê dil ve halel/zede dide ûbûdiyeta min” û munacat kiriye. Cenabê Heq, wê munacata wî ya xalis, safî û bêxerez ku tenê ji bo Xwedê teala ye, bi awayekî xayet nuwaze qebûl kiriye. Jê re kemala afiyetê îhsan kiriye û mezherî gelek cûreyên merhameta xwe kiriye.

Eve “**Penc Nukte**” hene di vê Lem’eyê de.

NUKTEYA YEKÊ

Li hember nexweşînên birînî yên xuyanî/zahirî yên Hezretî Eyyûb eleyhîssalam, nexweşînên me yên batînî/hundirî, rûhî û dilî/qelbî hene. Ku carekê hundirê me wergere derveyê me, derveyê me wergere hundir, em çawa ji Hezretî Eyyûb eleyhîssalam zêdetir birîndar û nexweştir in, dê bê dîtîn. Çimkî her gunehêkî ku em dikin, her gumaneke ku dikeve serê me, di dil û giyanê me de birînan vedikin.

Birînên Hezretî Eyyûb eleyhîsselam gef li jiyana wî ya kurt a dunyayê dixwar. Birînên me yên manewî/arişî, heyata me ya zaf dirêj a ebedî tehdîd dike. Em hezar carî ji wî Hezretî zaftir muhtacî wê munacata Eyyûbî ne. Nemaze çawan ew kurmên ku jî birînên wî Hezretî çê bûne, têkilî dil û zimanê wî bûne, wisan jî birînên ku ji gunehan tên û ew weswese û gumanên ku ji birînan derdikevin -neûzû billah-têkilî batinê dil ku mehellê/ciyê îmanê ye dibin, îmanê zededar dikin û têkilî zewqa rûhanî ya ziman ku tercumanê îmanê ye dibin û ji zikiran bi nefretkarî dûr dixin û hiş dikin.

Erê guneh ku li dil dikeve, bere bere dil reş dike reş dike, heta tê wê çendê ku nûra îmane jê derdixe û wî dilî hişk dike. Di her gunehêkî de rêyeke ku meriv pê diçe kufrê heye. Ew guneh, heke bi istixfarê zû neyête îmhakirin, ne kurm, belkî mîna marekî manewî yê piçûk dil dide ber gezan.

Mesela, merivek, gava gunehêkî ku meriv pê fedîkar dibe, veşartî kiribe û gava ji pêhisîna hinekan zaf fedî kir, hebûna ferîşte û rûhanîyan jê re pir giran tê. Bi nîşaneke piçûk dixwaze ku hebûna wan milyaketan mandel bike.

Hem mesela, gava merivek ku gunehêkî mezin ê ku pê ezabê Cehennemê encam dide kiribe, her ku gefên Cehennemê dibihîse, heke bi îstixfarê li hemberî wê, nekeve çeperê/sîperê, ji ber ku bi tevahiya giyanê xwe, tunebûna Cehennemê dixwaze, nîşanek û gumaneke piçûk, wêrekî û cesaretê dide wî/wê ku Cehennemê înkâr û mandel bike.

Hem mesela, merivekî ku nimêja xwe ya ferz nake û wezîfeya xwe ya ebdîtiyetê nayne cî û ew merivê ku ji femandarekî xwe yî piçûk gava ji ber nekirina wezîfeyê piçûk ku li sûfê wî bikeve tehl dibe, li hember fermanên dubare lipeyhev ên Sultanê Ezel û Ebed, dema zexeliyê ku di ferzên xwe de dike, ev, tahdehiyê mezin dideyê û ji ber wê tahdeyê, dixwaze û ji aliyê manewî ve dibêje ku: “Xwezî ew wezîfeya ûbûdiyetê tunebûya.” Û ji vê xwestekê, îca daxwaza mandelkirineke ku pêjn û bêhna dijminahiyeke Îlahî ya manewî jê bê, derdikeve. Gava gumanek, -li ser wucûda Îlahî-bikeve dilê wî, mîna ku delîlekî rasteqîn be, lê meyl dike ku xwe pê bigre. Deriyekî mezin ê helaketê jê re vedibe.

Ew bextreş difikire ku: Gava ez înkâr bikim ji giranî û tengahiyên ebdîtiyê xelas dibim [ku ev jî gelek sivik in] îca [ji bo ku ji vê giraniyê bifilite, vê înkârê qebûl bike,] nizane ku bi rêya înkâr û

mandelê, li şûna tengahîyeke gelek piçûk, bi înkare, xwe dike hedefê tengahîyên manewî ku bi milyonan caran ji wê tengahiyê erjengtir û bi dehşet-tir in. Ji pêvedana mêşê direve; pêvedana mar qebûl dike. Û mîna van... Bila bi van sê mînan were qiyaskirin ku sirrê ¹ **بَلْ رَانَ عَلَى قُلُوبِهِمْ** bê fêmkirin.

NUKTEYA DUDUYAN

Çawa ku di Kelîmeya Bîst û Şêşan de der barê sirrê qederê de hatiye îfadekirin, di musîbet û nexweşînan de, ji sê aliyan ve mafê meriv ê gilî û gazinê tune ye.

Aliyê Pêşî: Cenabê Heq ku libasa wucûdê li merivan kiriye, mezherî sin'etê xwe dike. Wî, meriv kiriye model, wê libasa wûcûdê li ser wê modelê dibire, didirû, diguherîne, xera dike û cilweyê wan îsmên Xwe yên cihê cihê nîşan dide. Çawa ku navê **Şafî** nexweşîne dixwaze, navê **Rezzaq** jî birçîtiyê divê. Û hwd.....

مَالِكُ الْمَلِكِ يَتَصَرَّفُ فِي مُلْكِهِ كَيْفَ يَشَاءُ²

1 Bil'ekis, li ser dilê wan, zeng (a ku ji ber gunehên wan çê bûye) heye. (Muteffifîn: 14)

2 Xwediyê mulk, di mulkê xwe de, çawan bixwaze, dikare wisan bike.

Aliyê Duduyan: Jiyan bi musîbet û nexweşînan pak û safî dibe, ber bi kemalê ve diçe, bi hêz dibe, tereqqî dike, encamê bi dest dixîne, tekemmul dike û kamil dibe, peywira jiyane tîne cî. Jiyana ku di nav nivîna yeknesak a îstirehetê de ye, ji wucûda ku xêr bi xwe ye zêdetir, nêzî wê ‘edema/tunetiya ku şer bi xwe ye û ber pê ve diçe.

Aliyê Sisêyan: Ev dara dunyayê, meydana îmtîhanê ye, ciyê xizmetê ye. Ne ciyê lezzet, ucret û mukafatê ye. Madem dara xizmetê ye; cî û taxa ubudiyetê ye; nexweşînan û mûsîbet, bi şertê ku ne dînî bin û sebir li serê bê kirin, zaf muwafiqê wê xizmet û ûbudiyetê ye û hêz dide wê. Û ji ber ku her yek saeteke wê, dikeve hukmê rojeke îbadetê, ne gilî, divê şukur bê kirin.

Erê îbadet du beş e: Beşek jê **musbet**, a din **menfî** ye.

Beşa musbet, [jixwe] tê zanîn.

Îca **beşa menfî**, bi nexweşînan û mûsîbetan, ew kesên mûsîbetzede, bi qelsî û kêmqewetiya xwe dihise, bi îltîcakarî, berê xwe dide Rebbê xwe yê Rehîm, hizrê Wî dike, bi Wî re dike zarebar û ji Wî re ûbûdiyetê xalis dike. Îca “riya” [ku heyê] nikare bikeve vê ûbûdiyetê; xalis e. Heke sebir bike, mukafata musîbetê bîne bîra xwe, hemd û sena

bike, wê hingê her yek saeteke wî, dikeve hukmê rojeke îbadetê. Temenê wî yê gelek kin û kurt, dibe temenekî dirêj. Hetta hinek ji van nexweş[iy]an heye ku yek deqîqeyeke wê, dikeve hukmê rojeke îbadetê.

Hetta min zêde mereqa nexweşîneke bidehşet a zatekî bi navê Muhacir Hafiz Ahmed ku birayekî min ê axretê ye, kir. Ji dilê min re hat îxtarkirin: **“Wî pîroz bike. Her yek deqîqeyeke wî dikeve hukmê rojeke îbadetê.”** Jixwe wî zatî, di nav sebrê de şukur dikir.

NUKTEYA SISÊYAN

Çawan ku me di Kelîmeyekê du Kelîmeyan/ Peyvan de beyan kiriye, her meriv, gava li jiyana xwe ya berê bihizire, an dê **“Ax!”** an jî **“Ox!”** bê ber dilê wî û ser zimanê wî. Ango yan bi ber dikeve, an jî dibêje **“Elhamdulîllah”**. Tiştê ku teessufê dide gotin, ew elemên manewî ne ku ji ber zewal û fîraqa wan lezzetên zemanê berê pêk tên. Çimkî zewala lezzetê elem e. Yekcaran lezzeteke muweqqet, elemeke daîmî dide. Îca hizirîn/ramîn jî, wê elemê der dike, jê teessufê dide palandin.

Lezzeta manewî û daîmî ku ji wê zewala elemên muweqqet ên ku meriv, di jiyana xwe ya zemanê berê

de dîtiye derdikeve, “**Elhemdulîllah**” dide gotin. Tevî vê rewşa fitrî, ew xêr û mukafatên uxrewî/axretî ku di encama musîbetan de tên û heke hizir bike ku temenê wî yê kurt, bi wesîteya mûsîbetê werdigere temenekî dirêj, ji sebrê zêdetir, îca şukur dike. Divê ku gotina

أَلْحَمْدُ لِلَّهِ عَلَى كُلِّ حَالٍ سِوَى الْكُفْرِ وَالضَّلَالِ¹
bibêje.

Gotineke navdar heye: “**Dema mûsîbetê dirêj e.**” Erê, dema musîbetê dirêj e. Lê belê weke ku di nava gel de tê zennkirin, ne ji ber ku bi tengasî ye dirêj e, [berevajiye vê] belkî **ji ber ku encameke pir mezin a heyatî ku weke qezenckirina temenekî dirêj bi merivan dide qezenckirin, dirêj e.**

NUKTEYA ÇARAN

Çawa ku di Meqamê Pêşî yê Kelîmeya/Peyva Bîst û Yekê de hatiye beyankirin, hêza sebrê ku Cenabê Heq daye merivan, heke meriv, wê di rêya ewhamê de belav neke, dikare li hember her mûsîbetê têra meriv bike. Lê belê bi zordariya wehmê û bi xefleta meriv û ji ber ku meriv, vê jiyana fanî, weke heyata

1 Kufir û dalalet ne tê de, li ser hemû kull û halî, hemd ji Xwedê re be. (Hedîs, Tirmizî, De'ewat: 128)

baqî tewehhum dike, hêza sebrê li dema berê û dema bê belav dike loma li hember mûsîbeta halê hazir, têr nake û meriv dest bi gilî û gazinan dike. ‘Eynî mîna ku (haşa) giliyê Cenabê Heq ji merivan re bike. Hem bi awayekî zaf zêde neheq û bi dînîtî gilî dike û bêsebrîyê nîşan dide. Çimkî her rojeke ku derbas bûye, heke bi mûsîbetê be, zehmetiya wê çûye, rehetiya wê maye, elema wê çûye, lezzeta wê ya ku di zewala wê de ye maye; tengahiya wê derbas bûye, xêra wê maye. Îca ji ber vê, ne gilî; belkî bi dilekî xweş divê spas bê kirin. Ji wan xeyd na; berevajiyê wê, divê jê were hezkirin. Ew temenê wî/wê yê bihurî û fanî, bi wasîteya mûsîbetê, bi awayekî ji awayan, dikeve hukmê ‘imrekî/temenekî baqî û mesûd. Heke meriv wan elemên ku di wan de hene, bîne bîra xwe û hinek ji wê sebra xwe, li hember wan belav bike, ev dînîtî ye.

Îca rojên ku dê bîn, madem hîna nehatine, ji niha ve meriv fikar ji nexweşîn, an ji mûsîbetên ku dê di wan rojan de bikşîne bike, bîponije û bêsebrîyê nîşan bide, gilî û gazinan bike, ehmeqî ye. Heke meriv îro bibêje: “Sibêro ez dê birçî bibim, ez dê tî bibim” û îro misêwa avê vexwe, xwarin bixwe, ka çendîn dînitîyeke ehmeqî ye; wisan jî, heke meriv li wan mûsîbet û nexweşînên rojên bê ku a niha tune ne bifikire û ji niha ve bi wan, elemdar bibe û bêsebrîyê

nîşan bide, tevî ku tu mecbûriyetek tune ye, meriv, li xwe bi xwe zulm bike, ev jî, ehmeqiyeye wisan e ku wê layiqbûna şefqet û merhemata derheqê xwe de, ji binî hiltîne, davêje.

Elhasil: Çawan şukur nîmetan dide zêdekirin; wisan jî, şekwa/gilî mûsîbetê dide zêdekirin. Hem layiqbûna merhemetê radike.

Di sala pêşî ya Şerê Cîhanê yê Yekê de, li Erzurûmê, zatekî mubarek, bûbû girîftarê nexweşîneke bidehşet. Çûm hafê, ji min re got: “Sed şev in min nekariye serê xwe daynim ser balîf û rakevim.” Bi vê yekê giliyekî pir dilşewat kir. Ez zaf pê êşiyam.

Ji nişka ve hat bîra min û min got:

“Birayê min, sed rojên te yên bi tengasî ku bihurîne, a niha di hukmê sed rojên bikêf de ne. Li wan mefikire û gilî meke. Li wan binihêre û şukur bike. Rojên paş jî, madem hîna nehatine, xwe bispêre rehmeta Rebbê xwe yî **Rehman û Rehîm**, megirî berî xwarina repikan, ji hîçiyê metirse, rengê wucûdê mede tunetiyê. Hizrê vê saetê bike. Hêza sebrê ya ku bi te re heye, têra vê saetê dike. Xwe meke mîna femandarekî dîn ê digel ku hêza dijmin a milê çepê, beşdarî aliyê wî yê rastê bûye û jê re bûye hêzeke teze û bi ser de jî dijminê milê

wî yê rastê ku hîna nehatiye, ew radibe, hêza xwe ya navendî li çep û rastê belav dike, navendê qels dihêle, dijmin bi hêzeke piçûk navendê xera dike.”

Min got:

“Birayê min, tu mîna vî meke. Hemû hêza xwe li hember vê saetê bimezixe [û texşîd bike]. Hizrê Rehmeta Îlahî û mukafata uxrewî bike û bifikire ku Ew, temenê te yê fanî û kurt, werdigerîne sûretekî dirêj û baqî. Li şûna vî giliyê dilsot, bi dilxweşî şukur bike.”

Bi temamî, bêhna wî fireh bû û wî got: “**El-hamdulîllah**, giraniya nexweşîna min ji dehan hêlabû daket yekê.”

NUKTEYA PÊNCAN

Sê mesele ye.

Meseleya Yekê: Musîbeta heqîqî û musîbeta bizerar, ew mûsîbet e ku tê serê dîn. Ji musîbeta olî/dînî, her gav divê meriv xwe bipenêhe dergehê Îlahî û feryad bike. Lê belê, mûsîbetên ku ne dînî/olî ne, di rastiya xwe ya heqîqetê de, ne mûsîbet in. Beşek jê îxtarên Rehmanî ne. Çawan gava şivan, kevir davêje mêşînên xwe yên ku dikevin erdê xelkê. Ew pez jî, ji wî kevirî pê derdixin ku ev, îxtarek/hişyarkirinek

e ku wan ji karê bizerar bifilitîne, loma bi memnûnî vedigerin. Wisan jî gelek mûsîbetên zahirî hene ku her yek jê, îxtareke Îlahî, qismek jê îqazeke Îlahî ne.. û beşek jê, kefarete guneh in.. û beşek jê, xefletê ji hev belav dike û wê kêmqewetî û muhtaciya merivî, tîne bîra meriv û bi awayekî ji awayan, huzûrê dide merivan.

Beşa musîbetê ya ku nexweşîn e, çawa ku berê jî behsa wê hat, ew beş, ne mûsîbet e, belkî, îltîfateke Rebbanî ye, paqijkirinek e. Di rîwayetê de heye ku: **“Bi hejandina dareka gihîştî û pîrxulî, çawa mêweyên wê dikevin, ji ber ricifandina tayê, guneh jî wisan diweşin.”**

Hezretî Eyyûb eleyhîssalam di munacata xwe de, ne ji bo îstreheta nefsa xwe dua kiriye. Belkî dema ku nexweşîn, ji zikrê zimanî û tefekura dilî re bûye asteng, ji bo xatirê ubudiyetê şîfa xwestiye. Amaca me ya pêşî bi wê munacatê divê ew be ku em, bi niyeta şîfayê dua bikin; da ku ew birînên me yên manewî û giyanî ku ji ber gunehan derketine, baş bibin. Gava ku nexweşînên maddî, ji ubudiyetê re bibin asteng, [ha wê hingê] em dikarin xwe ji wan bipenêhin. Lê belê bi awayê îtirazkarî, şikayetkarî na; belkî bi zelîlî û bi îstîmdatkarî / hawarxwazî divê em xwe bipenêhin û bispêrin. Madem em bi rubûbîyeta Wî qaîl in, li gor rastiya

wê rubûbiyetê jî, îca lazim e ku meriv, bi her tiştê ku Ew dide, qîma xwe bîne. Heke meriv, bi awayê **“Ax!”** û **“Of!”** ê gilî bike û li qeza û qederê îtiraz bike, ji awayekî ve, mîna ku meriv qederê tenkîd bike, Rehîmiyeta wî îttîham û tawanbar bike. **Yê ku qederê rexne/tenkîd dike, serê xwe li orsê dixe, dişikêne. Yê ku rehmetê tawanbar dike, ji rehmetê mehrûm dimîne.** Bi destê ku şikestiye, ji bo tolhildanê gava meriv wî destî bi kar bîne, çawan ku şikesteka wî destî zêde dike, wisan jî, merivê ku giriftarî mûsîbetê bûye, gava ku bi îtirazkarî, bi gilî û mereqê wê pêşwazî bike, musîbetê ducarî dike.

Meseleya Duduyan: Mûsîbetên maddî gava çiqas mezin bên dîtin, ewqas mezin dibin, gava piçûk bêne dîtin, piçûk dibin. Mesela, di şevan de, xeyalek tête ber çavê meriv, heke ew girîng bê dîtin mezin dibe, girîngî pê neye dayîn, winda dibe. Çawa ku meriv gava têkilî mêşên hingiv ên ku wan dest bi bi êrîşê kiriye bibe, zêdetir êrîş dikin, lê belê gava ku meriv guhê xwe nede wan belav dibin, eynî wisan, gava meriv, bi çavê mezin li mûsîbetên maddî binihêre, bi wasîteya mereqê, ew mûsîbet, ji cesedê derbas dibin û diçin di nava nîvê dil de reh û kok berdidin û mezin dibin, îca bi ser de jî, encama wê, dibe mûsîbeteke manewî, xwe dispêre wê, dewam dike. Kengê gava ku ew, bi xêra

qaîlbûna bi qeza û tewekulê, wê mereqê rake, mîna
birrîna reha/koka darekê, ew mûsîbeta maddî, sivik
dibe sivik dibe, mîna dara ku koka wê hatiye birîn
hişk dibe, diçe. Ji bo îfadekirina vê heqiqetê min
hiyamekê wiha gotibû:

*Dev ji feryada neçar berde ey bêçare li
hember belayê tewekkul bike,*

*Çimkî bizan feryad bela ender xeta ender
bela ye.*

*Heke te Yê ku bela dide dîtibe, sefa ender, eta
ender bela ye bizan,*

*Heke tu nebînî, hemû cîhan cefa ender fena
ender bela ye bizan.*

*Cîhanek tije ye bela ku li ser serê te, çi dibarî
ji ber belayeke piçûk?*

Were tewekkul bike.

*Bi tewekulê di rûyê belayê de bikene, da ew
jî bikene.*

Gava ew bikene piçûk dibe diguhere.

Çawan ku di pevçûnê de meriv li hember
dijminekî erjeng bikene, dijminahî bi aştiyê,
xusûmetî, bi henekê/yariyê diguhere, dijminahî

piçûk dibe; mehf dibe; meriv, gava bi tewekkulê pêşwaziya musîbetê bike jî, wisan e.

Meseleya Sisêyan: Ji her demekê re hukmek heye. Îro ku dema xefletê ye, mûsîbetê, teşe û şiklê xwe guherandiye. Di hin deman de û di hin kesan de bela, ne bela ye, belkî lufkeke Îlahî ye.

Ez, van nexweşok û mûsîbetzedeyên vê demê, -bi şertê ku mûsîbet têkilî dîn nebe- bextewar dibînim, ji ber vê yekê, tu fikrekê nade min ku ez bibim dijberê nexweşîn û mûsîbetan.. û hîsa/pêjna ku ez bi wan biêşim nayête min. Çimkî kîjan ciwanekî nexweş ku hatibe ba min, dibînim, li hember emsalên/hemsalên xwe, hinekî din girêdana wî, li ber peywira dînî û axretî heye. Ji ber wê, ez tê digihîjim ku di derbarê yên wisan de nexweşîn, ne mûsîbet e; ji awayekî ve nîmetekî Îlahî ye. Çimkî her çendî ew nexweşîn, zehmetekî nîşanî jiyana wî ya kurt û fanî ya dunyayê dide jî, sûdê/mifayê dide heyata wî ya ebedî. Ji awayekî ve, jê re dikeve hukmê îbadetan. Heke sihhet û afiyetê bibîne, ji ber serxweşiya ciwanî û sefaheta vê demê, helbet dê nikaribe wê rewşa xwe ya nexweşînê biparêze, belkî dê xwe bavêje nava sefîhiyê.

* * *

Xatîme/Dawî

Cenabê Heq, ji bo ku qudreta xwe ya bêhed û rehmeta xwe ya bêdawî nîşan bide, kêmqewetiyeye bêhed, destengiyeke/muhtacbûneke bêdawî di merivan de bi cî kiriye. Hem ji bo ku wan neqîşên bêhed ên navên xwe nîşan bide, Wî, meriv bi awayekî wisan afirandiye, çawan ku ev meriv, ji bêhed aliyan ve êş û eleman digire wisan jî mîna makîneyeke ku ji bêhed aliyan ve zewqan distîne xuluqandiye. Û di wê makîneya merivî de bi sedan halet hene. Êş û elema her yeke ji wan cihê, zewqa wan cihê, erka wan cihê, perûya/mukafata wan cihê ye. Mîna ku di wê alema ku “însanê ekber” e de, hemû îsmên Îlahî ku bi awayakî giştî tecellî dikin, wisan jî di wan merivên ku her yek jê alemeke piçûk e de, cilweyên temamê wan îsman hene. Di vê de çawan karûbarên mifadar ên weke sihet, afiyet û lezaîz, şukrê bi merivan didin gotin û ew, wê makîneyê, bi gelek aliyan sewqî wazîfeyên wan dikin. Meriv jî dibe mîna fabrîqeyeke şukrê. Wisan jî bi mûsîbetan, bi nexweşînan, bi eleman,

bi arizeyên dî yên muheyyîc û muherrik, çerxên dî yên wê makîneyê dixê tevgerê û tehyîc dike. Kana ze'îf, feqr û kêmqewetiyê ku di mahiyeta merivan de munderic in dide xebitandin. Ne bi zimanekî; belkî bi zimanê her yek azayekî, weziyeta hawarxwestinekê, îstîmdatekê didê. Tu dibêji qey meriv, bi wan arizayan dibe qelemeke wisan muteherrik/bitevger ku bi hezaran qelemî tezemun dike û di xwe de dihevine. Di rûpelê jiyana xwe de yan jî li Lewheya Mîsalî, muqedderata heyata xwe dinivîse, ji esmayê Îlahî re dike îlanname û dikeve hukmê qesîdeyê menzûmî ya Subhanî û wezîfeya xwe ya fitretê/xulqiyetê tîne cî.



**Ev name, ji bo doktorekî ku gelek zêde
muştaqê Rîsaleyên Nûr e û bi mutaleeya
wan hişyar bûye, hatiye nivîsandin.**

Merheba, hey doktorê bextewar ku kariye
nexweşîna xwe bi xwe nas bike, dostê min ê jidil,
semîmî û ezîz!

Ew întîbaha/hişyarbûna rûhî ku ji nameya te ya
gur û germ diyar dibe, layiqî pîrozkirinê ye.

Bizan(ib)in ku: **Di nav mewcûdan de, tiştê herî
hêja, jiyan e. Ê di nav wezîfeyan de karê herî
hêja, xizmeta ji jiyanê re ye. Ê di nav xîzmetên
jiyanî de jî, xizmeta herî hêja, ew e ku meriv
hewl bide ku jiyanê fanî, wergerîne heyata baqî.
Îca hemû qîmet û girîngiya vê jiyanê ha, di hêla wê
ya ku ew, ji heyata baqî re dendik, destpêk û cîderk
e de ye. Yan na, heke bi awayekî ku ew wê heyata
baqî bike jehr û xera bike, meriv xwe bi temamî
bide ser vê jiyanê fanî, dîwanetiyeke wisan e, mîna
ku meriv birûskeke anî/demdemî, li hember rojê
sermedî tercîh bike. Li gor nêrîna heqîqetê, yên ku
ji her kesî zêdetir nexweş in, ew doktorên maddî û
xafil in. **Heke bikaribin ji eczaxaneyê qudsî ya
Qurânê, wan dermanên îmanî ku tiryak-mîsal in,****

bigrin, hem dê nexweşînên xwe hem jî dê birînên mirovahiyê tedawî bikin îşallah. Ev hişyarbûna te, çawan ku ji birîna te re dibe melhem, ew dê te bi xwe jî, ji mereza doktoran re bike dermanek.

Hem tu dizanî, teselliyeke manewî, ji bo nexweşekî/e meyûs û bêhêvî, carinan ji hezar îlacî baştir e. Hal ku hal e, tebîbekî ku di ritama/avzêlka tebîetê de fetisiye, dibe sedem ku zulmeteke dî jî, bi ser wê bêhêvîtiya elîm a wî/wê nexweşê/a bêhêvî de zêde bibe. Îşallah ev întîbaha/hişyarbûna te, ji bêçareyên wisan re, dê te bike medarê teselliye û dê te bike tebîbekî binûr.

Tu dizanî ku **‘imir kurt e, karûbarên ku divê bîn kirin jî gelek zêde ne.** Gelo, heke tu jî, mîna min serê xwe teftîş bikî, di nav wan malûmatan de, tu dê bi rehetî bibînî çiqas tiştên nelazim, bêfeyde, bêqîmet ku mîna loda êzingan, wisan bêrûh hene. Çimkî min teftîş kir, min gelek tiştên beredayî û nelazim dîtin. Ha, divê meriv lê bigere ku wan zanînên fennî, wan agahiyên felsefî, bike bi feyde, bi nûr û bi rûh. **Tu bi xwe jî, ji Cenabê Heq, hişyarbûnekê bixwaze ku Ew bi xwe, fikra te li ser hesabê Hekîmê Zulcelal wergerîne; da ku Ew, agirekî bi wan êzingan bixe û wan bi nûr bike; da ku ew zanînên te yên nelazim ên fennî, bikevin hukmê wan marîfetên hêja yên Îlahî.**

Dostê min ê jîr! **Dilê min zaf dixwest ku ji ehlê fennê gelek meriv, bi wî ihtiyacê xwe yê bi nûrên îmanê û sirrên Quranê di radeya îstiyaqê de mîna Xulusî Begê, pê bihesin û xwe bikşînin pêş.** Hem madem **“Kelîmat”** [Rîsaleyên Nûr], dikare bi wicdanê te re bipeyive. Ferz bike ku her Kelîmeyeke/Peyveke wê, ne ji şexsê min, belkî ji delêliyê/tellalê Quranê, ji bo te nameyek e û her yek jê, ji eczaxaneyê qudsî ya Quranê, reçeteyek e. Di nav nehazirbûniya min de, ji xwe re bi wan, daîreyeke xweşsohbetê ya hazirane veke. Hem gava tu bixwazî, ji min re name binivîse. Heke ez bersiv nedim jî, bila li zora te neçe. Lewre ji berê ve, ez zaf hindik nameyan dinivîsim. Hetta sê sal e ku li hember gelek nameyên birayê xwe, tenê min yek hebekê nivîsandiye.

Seîdê Nûrsî



